

LÊKOLÎNÊN AKADEMÎK

ÊN KURDOLOJÎYÊ

II

Edîtor

Osman Aslanoğlu - Tahirhan Aydın - Muhammed Şerif Azarkan

Nivîskar

Ebubekir GÖREN - Emrah ÖZKAN - Eşref BURAN

Muhammed Şerif AZARKAN - Murat BAŞARAN

Osman ASLANOĞLU - Mehmet Salih SÖNER - Tahirhan AYDIN

Zeynep Sultan ATLI

Şarkiyat

Bilim ve Hikmet Vakfı Yayınları

Navê berhemê / Eserin adı:
Lêkolînên Akademîk ên Kurdolojîyê II

Editor:
Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU
Prof. Dr. Tahirhan AYDIN
Dr. Öğr. Üyesi Muhammed Şerif AZARKAN

Nivîskar/Yazar:

Ebubekir GÖREN
Emrah ÖZKAN
Eşref BURAN
Muhammed Şerif AZARKAN
Murat BAŞARAN
Osman ASLANOĞLU
Mehmet Salih SÖNER
Tahirhan AYDIN
Zeynep Sultan ATLI

Çapa yekê / Birinci baskı:
Berfanbar / Aralık 2025

@ Şarkiyat Bilim ve Hikmet Vakfı Yayınları
Tüm hakkı saklıdır

Isbn: 978-625-92926-8-7

Sertifika No: 52468
<https://www.sarkiyat.com>
e-mail: sarkiyatvakfi@gmail.com

LÊKOLÎNÊN AKADEMÎK ÊN KURDOLOJÎYÊ

II

Ebubekir GÖREN
Emrah ÖZKAN
Eşref BURAN
Muhammed Şerif AZARKAN
Murat BAŞARAN
Osman ASLANOĞLU
Mehmet Salih SÖNER
Tahirhan AYDIN
Zeynep Sultan ATLI

Editor:

Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU
Prof. Dr. Tahirhan AYDIN
Dr. Öğr. Üyesi Muhammed Şerif AZARKAN

Naverok

Pêşgotin	V
Jîyana Xelîl Xeyalî	1
Analîzê Estanika "Waya Hewt Birayan" Goreyê Îndeksê Motîfan Ê Stith Thompsonî.....	19
Berawirdîya Çar Hêmanan (Agir-Av-Ax-Hewa) Di Dîwana Rûhî Ê Heyderî Da	38
Nêrîneke Giştî Li Ser Kurteçîroka Bindarûkê*	54
Kürt Romanının Babası Erebb Şemo*	67
Di Pêwendîya Sazkirina Nasnameyê Da Erka Ziman	112

Pêşgotin

Akademîya Kurdî her roj bi xebatên mezintir û bi rêk û pêktir derdikeve meydana. Carinan rû bi rû bi bernamêyên wek sempozyûm û seminer, carinan jî bi xebatên nivîskî xwe nîşan dide. Berhemên bernamêyên wek sempozyûm û seminer jî piştî van çalakîyên zanistî, tên çapkirin û weşandin. Carinan jî nayên çapkirin. Ji ber wê li hêvîya derfeteke weşandina din dibin.

Ev xebata li ber destê we jî bi piranî ji berhemên pêşkeşîyan pêk hatiye. Hinek ji wan jî lêkolînên ku cuda û bi serê xwe hatine amadekirin in. Lê li cihekî nehatine çapkirin û weşandin. Bi her awayî armanca van çalaki û xebatan gîhîştandina hin agahîyan bo millet e. Bi vê xebatê jî me xwest ku em hin pêşkeşî û lêkolînên mamoste û lêkolînerên qada Kurdî bigêjin ber destê xwendevanan.

Di vê berhemê da 7 gotar hene. Gotarek Tirkî, gotarek Zazakî û 5 gotar jî Kurmancî ne.

Em hêvî dikin ku xebat û çalakîyên bi vî rengî zêdetir bin û bi vî şeklî her dem werin berhevkirin û çapkirin.

Ser Navê Edîtoran

Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU

Berfanbar / Aralık 2025

Jîyana Xelîl Xeyalî*

Halil Hayalî'nin Hayatı
The Life of Halil Hayalî

Emrah Özkan &
Muhammed Şerif AZARKAN¹

Kurte

Xelîl Xeyalî di wêje ya Kurdî de kesayetekî bi nav û deng e. Di Dîroka wêje ya Kurdî de Xelîl Xeyalî care yekem ji bo zimanê kurdî alfabeyeke bi tîpên erebî amade kirîye, tê zanîn ku wêje ya Kurdî de cara yekem werger ewî kirîye. Dema dawîya Osmanîyan de bi nivîsên xwe ji bo zarokên Kurda gellek xebat kiriye û mamostetî ya gellek zarên Kurd kirîye, wê demê hatiye Îstembolê li wir ji bo Kurdî dest bi xebatên xwe kirîye, li ser elfabeyê, li ser rêziman, li ser wergerê û ji bo zarokên kurda dibistanek vekirîye. Di gellek rojname û kovaranda nivîs nivîsiye û buye damezirînerê hin kovar û rojnameyan jî. Di gellek Komeleyên Kurdan de cih girtiye.

Li Sitembolê bi kesayetên kurd re têkildar buye û samîmîyeta wan bi dest xistiye, bi seîd Bedîuzzeman re demek derbas kirîye. Seîdê Kurdî di berhema xwe ye bi navê “*Asarî Bedîye*” de behsa wî dike û wî meth dike. Musa Anter, Zinar Silopî jî behsa wî dikin di bîranînê xwe de.

Xelîl Xeyalî bi Ziya Gökalp re li ser zimanê Kurdî gellek xebat kirine lê Ziya Gökalp ew xebat şewitandîye û paşê jî derbasê Tirkî buye û li ser Tirkî xebat kirîye.

Peyvên Sereke: Xelîl Xeyalî, Elîfbê ya Kurdî, Werger, Alfabe.

* Kurteya vê gotarê di sempozyûma bi navê “Dicle Üniversitesi Lisansüstü Öğrenci Sempozyumu 4-5 Kasım 2025”ê de hatiye pêşkêşkirin. Çap nebûye.

¹ Dicle Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Doğu Dilleri ve Edebiyatları Bölümü Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı, Yüksek lisans öğrencisi, emrahozkan2016@gmail.com, Dr. Öğr. Üyesi, Dicle Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Doğu Dilleri ve Edebiyatları Bölümü Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı, serifazarkan0324@gmail.com

Özet

Halîl Heyalî, Kürt edebiyatında önde gelen, tanınan bir kişidir. Kürt edebiyatı tarihinin ilk dönemlerinde, Kürtçe için Arap harfleriyle bir alfabe hazırlamış ve Kürt edebiyatında ilk çevirileri gerçekleştirmiştir. Osmanlı'nın son dönemlerinde, Kürt çocukları için birçok çalışma yapmış ve birçok Kürt çocuğuna öğretmenlik etmiştir. Bu dönemde İstanbul'a gelerek Kürtçe için alfabe, dil düzenlemeleri ve çeviri çalışmalarına başlamış, Kürt çocukları için de kaynaklar oluşturmuştur. Pek çok gazete ve dergide yazılar yazmış ve bazı gazete ve dergilerin kurucularından olmuştur. Aynı zamanda pek çok Kürt derneğinde de yer almıştır.

İstanbul'da Kürt şahsiyetleriyle yakın ilişkiler kurmuş ve onların samimiyetini kazanmıştır. Said Bediüzzaman, eserinde Xelîl Xeyalî'den bahseder ve onu över. Musa Anter ve Zinar Silopî de anılarında ondan söz ederler.

Xelîl Xeyalî, Ziya Gökalp ile birlikte Kürtçe üzerine birçok çalışma yapmıştır, ancak Ziya Gökalp bu çalışmalarını yarıda bırakıp sonrasında Türkçe üzerine yoğunlaşmıştır.

Anahtar Kelimeler: Halîl Hayalî, Kürt Alfabesi, Çeviri, Alfabe.

Abstract

Xelîl Xeyalî is a figure well-known by name and voice in Kurdish literature. In the early periods of Kurdish literary history, he developed an alphabet for Kurdish using Arabic letters and carried out the first translations in Kurdish literature. During the late Ottoman period, he conducted many efforts for Kurdish children and served as a teacher to numerous Kurdish youngsters. During this time, he also moved to Istanbul, where he began working on an alphabet, linguistic reforms, and translation projects for Kurdish, as well as creating resources for Kurdish children. He wrote for many newspapers and magazines and was a founder of some of them. He was also involved in numerous Kurdish associations.

In Istanbul, he built close relationships with Kurdish figures and earned their genuine trust. Said Bediüzzaman, mentions Xelîl

Xeyalî in his work and praises him, while Musa Anter and Zinar Silopî also mention him in their memoirs.

Xelîl Xeyalî collaborated with Ziya Gökalp on many Kurdish linguistic projects, but Ziya Gökalp eventually abandoned these efforts and focused on Turkish instead.

Key Words: Halîl Hayalî, Kurdish Alphabet, Translation, Alphabet.

DESTPÊK

Xelîl Xeyalî 1864-1926 ji Modka ye, ji qebîleya “Mûdan” e. Li cem Seîdê Nûrsî (1876-1960) ders girtiye û gelek di bin bandora wî de maye. Xelîl Xeyalî peşyê li Dîyarbekirê başê jî di dawîya sedsala 19an de çûye Stenbolê û li wê derê li ser xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî xebat kiriye. Di sala 1908an de li Stenbolê di damezirandina komeleyên bi navên “Kurd Te’avun û Teraqî” û “Kurd Neşrê Me’arif” de cih girtiye. Ji bo perwerdekirina zarokên kurdan bi zimanê kurdî di sala 1910an de ji aliyê komeleya “Kurd Neşrê Me’arif” ve li Çemberlîtaşê yekemîn dibistana kurdî bi navê “Kurd Nimûne Îbtidaîsî-Meşrutîyet” hatiye vekirin. Xelîl Xeyalî di vekirina vê dibistanê de rolek mezin lîstîye. Di vê dibistanê de li gor elfabeya wî ya ku em ê jê behs bikin, perwerdeyî bi zimanê kurdî hatiye kirin.

Di sala 1912an de li Stenbolê ji aliyê hinek xwendevanên kurd ve komeleya “Hêvî” hatiye damezirandin û heta Şerê Cîhanê yê Yekem dewam kiriye. Xelîl Xeyalî di damezirandina vê komeleyê de jî roleke girîng lîstîye.² Armanca herî girîng ya vê komeleyê ji bo hêskirina xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî amadekirina elfabeyeke kurdî bû. Xelîl Xeyalî di kovara bi navê “Rojî Kurd” de, ku organa weşanê ya vê komeleyê bû, li ser xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî û standardkirina elfabeyek ku ji bo temamê zaravayên kurdî bi

²Silopî, Zinar, (1997). Mes’eletu Kurdistan (Doza Kurdistan), Pêşkêşkîro: Îzedîn Mistefa Resûl, çapa duyemîn, Beyrut, r.33-35.

kar bê, çend gotar nivîsandine. Bo nimûne di hejmara sisêyan de di gotara xwe ya bi sernavê “Zîman” de pirsek wiha kiriye: “kurd îro muhtacê çi ne? Em ewan bêjin”. Paşê jî tiştên ku îhtiyaciya kurdan bi wan heye di 10 madeyan de rêz kiriye. Di madeyên duyemîn, sêyemîn û heştêmîn de wiha gotiye:³

2) Ser terzek nû elifbayek.

3) Ji bona temamê zîmanê kurdîtiyê qamûsek (ferhengêk mezin).

8) Ji bo zîmanê kurdan serf û nehwek (rêzîmanek).

Çawa ku ji madeya duyemîn jî tê fêmkirin ji ber ku baweriya Xelîl Xeyalî bi diviyatiya amedekirina elfabeyek standard ya kurdî hebû, di sala 1909an de li Stenbolê yekemîn elfabeya kurdî ya bi tîpên erebî çêkiriye û navê wê daniye “Elifbayê Kurmancî”. Seîdê Nûrsî (Kurdî) derbarê wî û elfabeya wî de wiha dibêje:

“Ez mînakek neteweperwerî ji we re pêşkêş dikim ku ew jî Xelîl Xeyaliyê Motkî ye. Mîna her beşek mîletperweriyê di beşa zîman de jî xelata pêşbaziye a wî ye. Wî elfabe û serf û nehv (rêzîman) a ku bîngehê zîmanê me ye çêkiriye. Vî zatê han nimûneyek mîletperweriyê nîşan daye û ji bo zîmanê me yê ku mihtacê temam kirinê ye bîngehek daniye. Ez ji ehlê hemiyetê (ji mîletperweran) re tewsiye dikim ku li pey rêça wî herin û zîmanê me li ser wê bîngehê ava bikin”.⁴

Çawa ku ji gotinên Seîdê Nûrsî tê fêmkirin wekî niha di wê demê de jî rewşenbîrên kurdan ji bo standartkirina zîmanê kurdî li ser elfabeyek standard nîqaş kirine. Di nîqaşên di vî warî de Seîdê Nûrsî xwestiye ku elfabeya Xelîl Xeyalî wekî bîngeh bê qebûlkin. Nexwe di nîqaşên îro de jî divê ev

³Rojî Kurd, (1913). hejmar:3, r. 21-22 (Amadekar: Cemal Xeznedar).

⁴Nûrsî, Seîd İki Mektebê Musîbet (Di nav “Asarê Bedî’iye” de), r.334 - 335.

elfabe neyê jibîrkin, beranberiya wê bi elfabeyên din bê kirin, kêmahî û zêdehiyên wê bên dîtin û jê were îstîfadekirin. Loma di vê nivîsa xwe de me xwest ku em vê elfabeyê bidin naskirin û wê ji tîpên erebî veguhêzin ser tîpên latînî.

Xebatên Xelîl Xeyalî

Xelîl Xeyalî ji lehçeyên zimanê Kurdî kurmancî û dimilkî, wekî din zimanê Farisî, Erebî, Fransîzî û Tirkî dizanibû.

- Elibêya Kurmancî: Di warê xwe de xebata ewilîn e.
- Serf û Nahîv: Rastnivîs û rêzimana Kurdî ye.
- Ferheng: Ferhenga Kurmancî
- Nivîsên wî yên di rojname û kovaran de di warê nesîrê de mînakên ewilîn in.
- Di kovarên mîna Rojî Kurd, Yekbûn û Jînê de nivîsên wî weşiyane.
- Di wergêriya Tirkî-Kurdî de ji wergêrên ewil e.

Lê xêncî nivîsên wî yên kovaran, tenê berhema wî ya “Elibêya Kurmancî” di destê me de heye. Elibêya Kurmancî vê gavê di weşanxana ‘Hîvda’yê de hatiye weşandin.

Endamtî û Damezrînerî

- Kürt Terakkî ve Teavün Cemiyeti
- Kürt Hêvî Cemiyeti
- Kürt Neşr-i Maarif Cemiyeti

Seîdê Bedîuzzeman û Xelîl Xeyalî

Di wan salên Meşrûtiyetê û piştê wî rewşenbîrên Kurdan ên li Stenbolê, gelek xebatan dikin û hema mirov dikare bibêje

piraniyê wan hevdu nas dîkin. Ew dem Seîdê Kurdî û Xelîl Xeyalî jî bi hev du re di Cem'iyeta Kürt Neşr-i Maarîfê û çend rêxistinên din de xebatên xwe didomînin. Bi rastî ew çax Seîdê Kurdî samîmiyeta Xeyalî dîtiye, loma di barê wî de nivîsek zehf hêja di pirtûka xwe ya Dîwana Herbî Urî de bi navê “Ziman mora qedera mirovan e” nivîsiye. Heçî sûretê mirovahiye ye, di reng û rûyê ziman de xweşikahiya xwe dide der. Ji ber ku zimanê maderzad sirûştî ye, bêtî ku lefz bîn vexwendintên bîra mirov. Ji ber ku danûsitandin tenê bi maneyê tê kirin, di nav dûriyanê de heyirî namîne û agahdariyên dikevin wî zimanî mîna “neqşê ale'lhacer/nexşên li ser kevir” mayende dimînin. Û her çî tiştên ku bi wî kirasê zimanê millî bixuyên henûn dibin. Va ye mîna keke welatparêziyê pêşkeşî we dikim ku; ew jî Mîrze Xelîl Xeyalî Motkîyî yê ku wekî di her beşê welatparêziyê de, di warê ziman de jî peşekiyê bi dest xistiye. Û alfabe, serf û nehwa ku esasên zimanê me ne, aniye wucûdê. Û heta ez dikarim bibêjim ku esra hemiyet, xîret, fedekarî û parastina zêfan gihiştandîye hev û wucûda wî ya manewî çêkiriye. Heqîqetên ji ber ku em li cewherekî wiha yê xîret ku ji kana Kurdistanê ye rast hatine, hêvî heye ku dê gelek cewherên wekî wî pêşeroja me ronahî bikin. Va ye ev zat, nimûneyeke welatparêziyê ya ku hêjayî mirov bide dûv nîşan daye û ji bo zimanê me yê millî ku muhtacê kemilînê ye temekek avêtiye. Ez mirovên bixîret şîret dikim ku li dûv rêça wî herin û li ser temelê wî ava bikin.⁵

Di derheqê Xelîl Xeyalî de çend gotinên Qedrî Cemîl Paşa (Zinar Silopî)

Bi rastî ez divê di barê mirovekî ku li Stenbolê ji xwendekarên Kurd re Mamostetî kiriye û bi xwe jî mirovekî xwedî haşmet û feraset û Kurdek gelek mezin de çend gotinan bêjim. Ev mirov Xelîl Xeyalî Motkî Beg e. Welatparêzekî rewşenbîr û hemiyetperwer bû. Me ciwanan, vî şexsê di sala 1909an de li Stenbolê nas kir. Ew çax temenê

⁵Kurdî, S. (2009). Dîwana Herbî Urî, Zehra Yayınları, İstanbul.

wî devû dorê pêncî salî bû. Rojên îne li çayxana Diyarbekir Kirathanesi ya li Divanyoluyê, me dicivand. Li ser dîroka Kurdistanê û li ser dost û dijmintayiya kurdan gelek tiştan vedigot. Dawiya suhbetên wî yê dîrokî, netewî û edebî, ji xweşbûnê nediqediyar. Me bi eleqeyek, zewqek û kelecaniyekê bê dawî guhdar dikir û em gelek tiştan jî hîn dibûn. Ev şexsê han li Stenbolê qasê 20 salan mamostetî kiriye. Lê tu car jê nekerixiye.

Dema ku ez di sala 1928an de ji girtîgeha Kastamonuyê de derketim, çend caran çûme dîtnaya wî. Hema hema qasê du salan di nav cîh de bûye. Wextê ku ez di sala 1929an de ji Stenbolê veqetiyam, ev merivê mezin û qedirbilind zêdetir nexweş ketibû.⁶

Di derheqê Xelîl Xeyalî de çend gotinên Mûsa Anter

Mûsa Anter di pirtûka xwe yê “Hatıralarım” de wiha dibêje: “Dema ku min Xelîl Xeyalî dît, ji ser hesabgiriya Fakûlteya Daristanê teqawîd bibû. Kalekî sûret-nûr bû. Tu çiqas bêjî çandyar û ew qas jî xwedî feraset bû Xelîl Xeyalî. Çavên wî ji Eşqa welêt diçilwîlîn. Digot daxwaza min ew e ji Xwedê, di saxiya min de ez bibînim ku milletê Kurd ji van milletên stemkar xelas bûye. Bi keça xwe ya Necmîye re dijiya.

Xelîl Xeyalî nêzî çûyina xwe ya ebediyetê, xebatên xwe dane min. Di nav wan de belgeyên pir girîng hebûn. Wekî din xebatên Ziya Gökalp ên li ser zimanê Kurdî jî hebûn.” Li ser Xelîl Xeyalî çend gotinên paşîn bi rastî piştê ev qas gotin mirov êdî nizane çi bibêje ji bo mêrxasê egî û gencîneyê delal re. Lewra ji rindiyê re gotin ne hewce ye. Tenê guhdarkirin e ji çend xeberên wî û temaşe kirine li hember rastî û paqîjiya wî. Di dawiyê de xwe xwarkirin e ji keda wî ya ji huzna tarî derketî. Heger ev qas kes di we de cewherek, kedek, xebatek, roniyek û esil û asasiyek nedîtiba bi qesem nedipejirandin evqas pesn ne hubra reş û ne jî kaxizê sipî. Lê me biborin û efû bikin, me qedrê we nizanibû. Lê Xwedê hezke tenê ji bo

⁶Silopî, Z. (1992). Doza Kurdistan, Pınar Yayınları, Ankara.

samîmiyeta we û yên wekî we be jî, natemire ev difna han li hember zilma reşe-tarî.⁷

Têkiliya Xelîl Xeyalî û Ziya Gökalp

Xelîl Xeyalî dema ku di salên 1900î de li Stenbolê bi ciwanên Kurdan re di barê netewperwerî, hemiyetperwerî û meseleyên netewî de danûstandinan dikin, bi tewafûqî vî çaxê Ziya Efendî nas dike. Ew dem Ziya Efendî seba fikrên xwe yên azadîxwaz ji Mekteba Tibbê tê avêtin. Ji xwe piştê ku Ziya Efendî şîrheramî dike û xwe Tirk dipejirîne, ew çax navê xwe jî diguherîne û dixê Ziya Gökalp.

Xelîl Xeyalî û Ziya Gökalp bi hev û du re serf û nehwa Kurdî dinivîsin û piştê dest bi nivîsîna ferhengê jî dikin, lêbelê ji ber ku Ziya Efendî ji Mektebê tê avêtin, mejbûr dimîne ku biçe Amedê. Dema ku diçe jî van berhemên ku hatine nivîsîn bi xwe re dibe. Piştê vî heya Meşrûtiyetê, têkiliya wan tê birîn. Lêbelê piştê Meşrûtiyetê ji bo civîna Cemiyeta İttihad û teraqqiyê li ser navê delegeyên Amedê Ziya Efendî beşdar dibe. Wê demê Xelîl Xeyalî li Stenbolê wî dibîne û jê xebatên ku nivîsîna dixwaze. Lê mixabin ew ji ber ku hez nake bide, dibêje min şewitandiyê. Lê mêrê mêrxas Xelîl Xeyalî dizane ku hewcedariya gelê Kurd bi van berheman heye, ji bo wê jî nû ve dinivîse.

Wergera ji zimanên biyanî bal bi kurdî

Di derbarê welgerê de yekem kesê ku tê zanîn Xelîl Xeyalî ye. Du helbestên tirkî wergerandine kurdî.⁸ Wergera ewila Xelîl Xeyalî di Rojî Kurdê de wergera helbesteke Mehmed Akîf [Ersoy] e. Helbest bi hedîseke Hezretî Pêxember a di

⁷Anter, M. (2007). Hatırlarım 1-2, Avesta Yayınları. İstanbul.

⁸ Xelîl Xeyalî herwiha nivîseke derbareyê tefsîra Quranê de jî wergerandiyê kurdî lê ji bela ku ew nakevê nav wergera wêjeyî min qala wê nekir. Bnr. Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913, amd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2013, r. 183-186.

wateya “Kî derdê misilmanan neke derdê xwe ew ne ji wan e” dest pê dike û di bin de jî têbineyeke wergêrî heye: “Ev hedîsa ha ji anî Mehmed Akif beg şair[ê] meşhûr [ê] tirkî bi ziman[ê] şîrê hatiye gotin, em jî ji bo kurdan tercûme dikin, eger tê da kêmasîk hebê lê biborin.”⁹

Her çiqas îro ji ber ku Merşî Serxwebûnê ya Komara Tîrkiye (Îstiklal Marşı) nivîsandiye wekî “Şairê Milî” bê binavkirin jî Mehmed Akîf wê demê yek ji parêzvanê fîkra îslamî bû û îtîfaqa misilmanan diparast. Wî nezanî, kasûlî û xemsariya misilmanan rexne dikir û ev yek di piraniya helbestên wî de û di vê ya ku Xelîl Xeyalî wergerandiye de xuya dike:

Li kû ye mislimanî! Ji me boriye heta merivayî

Ger xelq xapandine meqsed: kes nake bawerî

Çend misilmanî heqîqî min dî: hemû li qebrê da ye

Misilmanî, nizanî heye ema xala min di heşrê da ye ¹⁰

Wergera duyem a Xelîl Xeyalî jî di Hetawî Kurd de wergera helbesteke Tahîrû'l-Mewlewî ye: Tahîrû'l Mewlewî yan jî bi navê xwe yê fermî Tahîr Olgun (1877-1951), yek ji helbestvan û rewşenbîrê tirk e. Wî, ev helbesta xwe li ser koçberên Rûmelî ku piştî Şerê Balkanan mecbûr mane warê xwe biterikînî û werin nav sînorên Osmanî nivîsandiye. Ev helbest, ji aliyê Rumelî Muhacîrîn-i Îslâmîye Cemiyetî ve [Civata Goçberên Misilman ên Rûmelî] wekî broşûreke mezin çap dibe û bo arîkariya wan tê firotin.¹¹ Li ser broşûrê

⁹ Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd (1913). Amd. Koma Xebatên Kurdolojîyê, r. 163.

¹⁰Rojî Kurd, j.2 (6 Temmuz 1329/ 19ê tîrmeha 1913an), r. 32. Ji tîpguhêziya latînî ya temamê helbestê bnr. Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913, amd. Koma Xebatên Kurdolojîyê, r. 163-164. Ji bo orjînalê helbestê bnr. Safahat, amd. M. Ertuğrul Düzdağ, Çağrı Yayınları, İstanbul, 2006, r.286.

¹¹Akdağ, Emin-Söylemez, Haşim “Sürgün yurdu Anadolu”, Aksiyon, h. 494 (34-30 gulan 2004), <http://www.aksiyon.com.tr/aksiyon/haber-9495-34-surgun-yurdu-anadolu.html>, 28.02.2014

bi puntoyeke mezin “Bulgar Mezalimi [Zilma Bulgaran]” dinivêse, di bin de jî gotina “Intikam Levhası [Lewhaya Tolhildanê]” derbas dibe. Ev îfade jî û zimanê helbestê jî pir hêrs e û misilmanan bangî tolhildanê dike.

Xelil Xeyalî, ev helbesta Tahiru’l-Mewlewî 28ê sibata 1914an de wergerandiye kurdî û ew tevî orjînalê wê di dehemîn hejmara Hetawî Kurd de hatiye weşandin. Helbest jî şeş çarînan pêk tê û di kovarê de wekî du stûnan çap bûye. Li stûna rastê orjînalê helbestê, li aliyê çepê wergera wê ya kurdî cih digire:

Kulağında küpe olsun unutma

Rûmî ilinin dağı taşı ağlıyor

Kan içinde her subaşı ağlıyor

Parçalanmış gövdelerin yanında

Can çekişen arkadaşı ağlıyor

Bîr meke bile di goy te da guwar be

Dar û berê Rûm îlî digirî

Di nav xwîn da her çem û kanî digirî

Li bal cendek[ê]d parî bûyî

Heval[ê] li ser rih danî digirî ¹²

Nivîseke Xelîl Xeyalî “WETEN û ÎTTÎFAQA KURMANCA”¹³

Weten, tu çi qa ezîzî, tu çi qa letîfî! (Lalezarê te) jî xwîna şehîdan e. Sinbil û rihanê te jî rindiya çavê egîtan e. Wextekî

¹²Hetawî Kurd, j.10 (20 hezîran 1330 / 3ê tîrmeha 1914an), r. 14-15. Ji bo tîpguhêziya latînî ya temamê orjînalê helbestê bnr. Tarîh ve Toplum, j.87(mart 1991), r.64.

¹³Ev nivîs jî rojnameya Kürt Teavûn ve Terakkiyê hatiye hildan. M. Emin, Bozaslan.

her terefê te ava bû, her goşê te mecmeê siwaran bû, dar û berê te menzîlê xortan û lawan bû; deştê te bi cotyaran, zozanêd te bi konan, newalêd te bi kerîyê pezan, mêrgêd te bi refê hespan, guher û mexelêd te bi bêrîvanan xemilîbû; her aliyê te wekî cenneta derewî bû; ne di dilê me da girîyek, ne di terşê me da kêmasiyek hebû.

Nagah tofana zilm û îstîbdadê muselletê te bû, ewladê te kuşt, her terefê texira kir, tê da eserê şahî û bextyariyê nehîşt. Weten, tu îro ji destê zulmêwâran î, meskenê bûman û maranî.

Ewladê te sefil û perîşan e; jin û zarûyê wan tazî û birçî ye. Hukûmeta zalim me Kurmancan muselletê hevkir, dersê kuştin û talan kirinê da. Me jî ji bo xatirê wan zaliman, ji bo dîlxwestê wan fir'ewn û şedadan xan û manê xwe şewitand.

Îro jin û zarûyêwan zaliman di koşkanda bi rahatî û bi dîlxweşî umrê xwe dibûrînin; jin û zarûyê me ji tazîtîyê û ji birçîtîyê li ser erdê sar, li binê berf û baranê dinalin. Eger me'mûrêd zalim bi zulmê Fir'ewnîya xwe, bi xirabkirina wetenî, bi perîşan kirina ewladê wetenî qenaet bikiran, jibo me Kurmancan seadetek mezin mirovanîyek bilind bûya. Hal ew e ku ji aliyek urt û ocaxê diqelandin, jinê me jinebî, zarûyêd me sêwî dihîştin; ji aliyê dî me nezera alemê da eşqiya û bêqabîliyet nîşan didan.

Ah, wan zalima ewil me Kurmancan ji xwendinê, paşê ji ticaret û zîraetê merhûm(26 hîştin); paşê her çi xwestin der heqê me da îcra kirin û gotin, Xwedê û pêxember bîra xwe neanîn. Bi hîmmetacem'îyeta Îttihadê, bi muaweneteta ekserî, Qanûna Esasî derket, belayê zulmê ji ser me rabû.

Meb'ûsa muhterema civîya û Meclîsê Meb'ûsan û halê wetenî dê bêjin. Xwedê heman tewfîqa wan bide, çavê xainan kor bike. Kurmanc di nav qewmê Osmanî da unsurek mezin e, dîndar e, ciwanmêr e, jêhatî ye.

Kîjan qîrîn bûye ku siwarê wan, egîdê wan di serheda weten da xuya nebûye, jibo hifza wetenî, jibo şerefa milletî, jibo bilindîya dîyanetê xûna xwe nerêtiye, ji meydanê qîrînê rûyê xwe zivirandiye, hemîyeta xwe, xîreta xwe, dîndarîya xwe

nîşan nedaye, jibo tarîxan navek qîmetdar nehîştîye? Feqet Hukûmeta müstebida mêranîya me, zekaweta me daîma înkâr kir.

Nef'a xwe di îxtîlafa me da dî. Me jî ji nezaniya xwe xebera wan kirin, xan û manê xwe xira kir, rûhê bab û bapîrê xwe mehzûn kir, dilê zaliman şa kir. Ji vî halî îbret bitsînin, wekî Ereban, wekî Tirkan, wekî Arnavudan, wekî Rom û Filan bixebitin, cewherê xwe bidin naskirin. Qewmê necîbê Arnavud çawan da'wayê xûna sed sale xwe terk kirin, destê hev girtin, qîmeta xwe, mêranîya xwe dane zanîn, em jî wekî wan da'wa xûnê, da'wa neyarîyê hilînin, birayê hev bibin, şerefa Kurmancîyê muhafeze bikin, bi mal û bi can bixebitin, wetenê xirabê xwe ava bikin! Gelî Kurmancan!

Wetenê xwe hez bikin. Çunkî mehebeta wetenî ji îmanê ye. Gelî biran! Dijminî û neyarîyê ji dilê xwe derxin, aşt bin, bi hukmê "înnemelmû'mînûne îxwetu emel bikin.

Gelî hevalan! Mekteban vekin, ewladê xwe bidin xwendin, arê nezaniyê li ewladê xwe layiq mebînin. Çunkî emrê "Utlubul'ilme mînelmhdî illelled" li me ferz e. Ey ulemayê navdar, ey meşayîxê xwedan 'îqtîdar, ey ruesayê sahibnufûz ê Kurmancan! Hun enc bizanin ku heyata qewmê me, selameta wetenê me di ittîfaq û xîreta we da ye.

Adetê berê terk bikin, Kurmancan bi hev bixin, ji wan ra ji qencîyê û xirabîyê bêjin. Çunkî hun zana ne, ew nezan in. Delalet bikin. Ew delaleta we jibo nef'a wetenî, jibo tereqqîya miletî ye, jibo nefsa we nî ye. Roja heşrê bîra xwe bînin. Dinyayê fanî da navê xwe bi qencî baqî bikin, hukmê "Ehsîn kema ehsenellahu îleyke" ji aqilê xwe dermexin.

Alfabeya Xelîl Xeyalî

Çawa ku ji gotinên Se'îdê Nûrsî tê fêmkirin wekî niha di wê demê de jî rewşenbîrên kurdan ji bo sitandartkirina zimanê kurdî li ser alfabeyek sitandart nîqaş kirine. Di nîqaşên di vî warî de Se'îdê Nûrsî xwestiye ku alfabeya Xelîl Xeyalî wekî bingeh bê qebûl kirin. Nexwe di nîqaşên îro de jî divê ev

alfabe neyê jibîrkin, beranberiya wê bi alfabeyên din bê kirin, kêmahî û zêdehiyên wê bên dîtin û jê were îstîfadekirin. Loma di vê nivîsa xwe de me xwest ku em vê alfabeyê jî bi çend gotinan bidin naskirin:

1) Alfabeya Xelîl Xeyalî yekemîn alfabeya kurdî bi tîpên erebî ye.

2) Ev alfabeya bi hemançapî di pirtûka Mehmet Bayrak ya bi navê “Açık-Gizli, Resmi-Gyr-ı Resmi Kürdoloji Belgeleri” de hatiye weşandin.

3) Hogir Tahir Tewfîq di xebata xwe ya bi navê “el-Elifbau’l-Kurdiyye Bi’l-Hurûfi’l-Erebiyye We’l-Hurûfi’l-Latiniyye” (Elfabeyên Kurdî yên Bi Tîpên Erebi û Latîni) de li gor çapa Mehmet Bayrak alfabeya Xelîl Xeyalî jî qeyd kiriye.¹⁴

4) Alfabe ji aliyê weşanxana “Hîvda ” jî bi tîpên erebî hatiye weşandin.¹⁵ Lê tê de hinek guhartin û şaşî hene.

5) Alfabe ji 34 tîpan pêk tê. Ev tîp digel Latîniya wan ev in:

ا =Ab ب =Bb پ=Pp ت =Tt ث =Ss ج =Cc چ=Çç
 ح =Hh خ=Xx د=Dd ذ =Zz ر=Rr ز=Zz ژ=Jj
 س=Ss ش=Şş ص=Ss ض=Dd ط=Tt ظ=Zz ع=‘
 غ=Ğğ ف=Ff ف=Vv ق=Qq ك=Kk گ=Gg ل=Ll
 م=Mm ن=Nn و=Ww ه=Hh لا=La ي=Yy

6) Alfabe digel mînak û agahiyên cûrbecûr ji 27 rûpelan pêk tê. Naveroka rûpelan wiha ye:

a) Rûpela yekemîn qapax e. Tê de navê xebatê (Elîfbayê Kurdî), navê nivîskar (Xelîl Xeyalî Motkî), navê çapkiroxe (Kurdîzade Ehmed Ramîz) û sala çapê (1325) cih digire.

¹⁴Tahir Tewfîq, Hogir. (2005). El-Elifbau’l-Kurdiyye Bi’l-Hurûfi’l-Erebiyye We’l-Hurûfi’l-Latiniyye, çapa yekem, Erbil, Ji bo agahiyên derbarê Xelîl Xeyalî û alfabeya wî di vê kitêbê de binêrin r. 23-40 .

¹⁵Reşîd Ehmed, Cemal, (2003). Zuhûru’l-Kurd Fî’t-Tarîx , Erbil, I, 61.

b) Di rûpela duyemîn de 34 tîpên alfabeyê hatine nivîsandin ku me van tîpan digel Latîniya wan li jor da nîşandan.

c) Di rûpelên sêyemîn, çaremîn û pêncemîn de navê van tîpan û rewşa nivîsandina wan di ser û nav û dawiya bêjeyê de hatiye nîşandan.

d) Di rûpela şeşemîn û heftemîn de li ser rewşa dirêjkirina tîpan, tîpên bênuqte, tîpên biyeknuqte, tîpên bidunuqte û tîpên bisênuqte hatiye sekinandin.

e) Nivîskar di rûpela heştemîn de li ser bilêvkirina tîpan li gor ser û cer û ber yên erebî ku ji wan re “hereke” tê gotin sekiniye. Mînak: Be, bi, bu; te, ti, tu.

f) Di rûpela nehemîn de nivîskar behsa “tenwîn” a erebî kiriye û bal kişandiye ku di zimanê kurdî de tenwîn nîne. Çawa ku tê zanîn tenwîn di dawiya navdêrên erebî de cih digire û wekî du seran, du beran an jî du ceran (“..en”, “..in”, “..un”) tê bilêvkin. Ji bo nimûne tîpa ب=Byê gava di dawiya navdêrek erebî de cih bigire wiha tê xwendin: Ben, bin, bun. Di rûpelên di pey re mînakên cûrbecûr cih girtine.

g) Di rûpelên 23 û 24an de di bin sernavê “Îbare” de nivîskar bi şîklê şêrê hinek nesîhet kirine. Mînak: Ders bixwune, zimanê Kurmancî hûbe.

h) Nivîskar di rûpelên 24, 25 û 26an de hinek du’ayên erebî nivîsandine.

i) Di rûpela dawîn de di bin sernavê “Rica” de wiha hatiye nivîsandin:

“Behayê vê (elfabeyê) ji bo tebi’kirina (çapkirina) kutubê (pirtûkên) Kurmacan e. Li pey vê, qiraet (xwendin) û serf (morfoloji=peyv sazî) û nehv (rêziman) a zimanê Kurmancî jî dê tebi’ bibe (were çapkirin). Feqet em muhtacê arîkirinê ne. Bê arîkirin tiştik nabe. Hêviya me xeyret û cuwamêriya Kurmacan e. Meqseda me jî zarokê Kurmacan ra nîşandana rêya ‘ilm û hunerê ye”.

7) Tiştêk balkêş jî ev e ku Xelîl Xeyalî bêjeya “Kurmanc” wekî “Kurmac” bi kar anî ye. Ango cih nedaye tîpa “n”yê. Berê me got qey viya kêmasiyeke çapî ye.

Lê me dît ku Cemal Reşîd Ehmed di kitêba xwe ya bi navê “Zuhûru’l-Kurd Fî’t-Tarîx” de dibêje ku di dema Mîrektiya Erdelan de Mîrê kurd yê bi navê Xusrev b. Muhemmed di destnivîsek xwe de bêjeya “Kurmanc” wekî “Kurmac” bi kar aniye û ev destnivîsa han di sala 1984an de li Moskovayê hatiye çapkirin.

8) Wê demê me fêhm kir ku di nav hinek nivîskarên kurd yê berê de navê “Kurmanc” wekî “Kurmac” jî hatiye xebitandin.

ENCAM

Ev xebat, cihê Xelîl Xeyalî di dîroka ziman û edebiyata kurdî de, bi taybetî jî di çarçoveya standardkirina zimanê kurdî, veguherîna wê bo zimanek nivîsî û bi rêya perwerdehiyê kurumsalkirina wê de, nirxand. Xelîl Xeyalî, ku di dawiya sedsala 19an û destpêka sedsala 20an de di cîhana rewşenbîrî ya Osmanî de çalak bû, zimanê kurdî ne tenê wekî amûrekî şandina çandî, lê her weha wekî zimanekî zanistî û perwerdeyî yê divê bi rêz û rêzik bê pêşvebirin dît. Ji vî aliyê ve, xebatên wî dikarin wekî hewldanekî pêşîn û bi hişmendî ya plansazîya zimanî di pêvajoya modernbûna zimanê kurdî de were xwendin.

Yek ji herî girîngtirîn beşên karên Xelîl Xeyalî, hewldana wî ya ji bo çêkirina elfabeyek hevpar û bikaranînbar ji bo zimanê kurdî ye. Berhema wî ya bi navê Elifbayê Kurmancî, bi bingeha tîpên erebî, yekem alfabe ya bi rêz û rêzik a kurdî ye û ji hêla dîrokî ve girîngiyeke taybet heye. Ev alfabe ne tenê ceribandinek teknîkî ya nivîsandinê ye, lê her weha nîşana armanca çêkirina standardekî zimanî ye ku bikare hemû zaravayên kurdî bi hev re bîne. Bi şertandina alfabe, xebatên li ser serf û nehiv jî nîşan dide ku Xelîl Xeyalî ziman wekî pergaleke tevahî û bi rêz dît. Ev nêrîn ji aliyekî din ve dikare wekî mînaka pêşîn a têgihiştina zimanî ya nêzîkî zanistên zimanî yê nûjen were nirxandin.

Çalakiyên Xelîl Xeyalî di warê perwerdehiyê de jî wêneya pratîk a nêrîna wî ya li ser zimanê kurdî nîşan dide. Dibistana kurdî ya yekem ku li Stenbolê di bin çavdêriya komeleyên kurdî û bi taybetî Kurd Neşr-i Maarif Cemiyeti hate vekirin, bi awayekî pratîk nîşan da ku zimanê kurdî dikare wekî zimanê dayikê yê perwerdehiyê were bikaranîn. Van hewldanan rê li ber ku zimanê kurdî ji sînorên çanda devkî derkeve û bibe zimanek nivîsî û kurumsal vekir. Wekî din, nivîsên Xelîl Xeyalî yên di kovar û rojnameyan de, di pêşketina nesra kurdî de rolekî bingeîn lîstin.

Têkiliyên Xelîl Xeyalî bi rewşenbîrên wekî Seîdê Kurdî (Said Nursî), Ziya Gökalp û kesayetên din ên demê, nîşan dide ku bandora fikrî ya wî bi tenê di nav çerxa kurdan de nehatiye sînorkirin. Gotin û nirxandinên Seîdê Kurdî li ser Xelîl Xeyalî, bi vekirî destnîşan dikin ku xebatên wî di warê ziman de ji hêla hevdemên xwe ve jî wekî mînaka hişmendî, fedakarî û hemiyetperwerî hatine qebûlkin. Wekî din, karên wî yên wergerîyê şertên îfadeya zimanê kurdî fireh kirin û wê bi cureyên cuda yên edebî re hevkeş kir.

Di encamê de, Xelîl Xeyalî di pêvajoya standardkirina zimanê kurdî, perwerdehiya wê û veguherîna wê bo zimanek nivîsî de rolekî pêşeng lîstîye. Xebatên wî di warên alfabe, rêziman, ferheng û perwerdehiyê de, di nav hewldanên pêşîn ên avakirina bingeîn hişmendî yên bilinciya zimanê kurdî de cih digirin. Îro, di nîqaşên akademîk ên li ser zimanê kurdî de, ji nû ve nirxandina karên Xelîl Xeyalî ji bo têgihiştina domdarîya dîrokî û ji bo bexşandina tevkeriyê bo nîqaşên nûjen ên plansazîya zimanî girîngiyeke mezin heye.

ÇAVKANÎ

- Akdağ, Emin-Söylemez, Haşim “*Sürgün yurdu Anadolu*”, Aksiyon, h. 494 (34-30 gulan 2004), <http://www.aksiyon.com.tr/aksiyon/haber-9495-34-surgun-yurdu-anadolu.html>.
- Anter, Musa, (2011). *Hatıralarım*, Aram Yayınları 2. Baskı, İstanbul.
- Anter, M. (2007). *Hatıralarım1-2*, Avesta yayınları, İstanbul.
- Aslanoğlu, Osman, (2019). *Ruhayi Divan şiiri Sözlüğü*, uzun dijital matbaası.
- Celil, Celil, (2001). *Kürt Aydınlanması*, Avesta Yayınları, İstanbul.
- Düzdağ, M. Ertuğrul, (2006). Çağrı Yayınları, İstanbul.
- Erbîl, (2005). “Ji bo agahiyên derbarê Xelîl Xeyalî û elfabeya wî di vê kitêbê de binerin”.
- Hayali, Halil Mutki, (1908). *Elifbayê Kurmancî*, Tabî: Kurdizade Ahmed Ramiz.
- Hetawî Kurd*, (1913). sayı: 1, 23 Zilkade 1331, Resimli Kitap Matbaası.
- Nursî, Seîd: *İki Mektebê Musîbet*, Di nav “Asarê Bedî’iye” de.
- Reşit Ahmet, Cemal, (2003). *Zuhûru’l-Kurd Fî’t-Tarîx*, Erbîl.
- Rojî Kurd*, (1913). *Hejmar: 3*, (Amadekar: Cemal Xeznedar).
- Rojî Kurd*, (1913). “*Resimli Kitap Matbaası*” sayı: 4, 10 Şevval 1331.
- Silopi, Zinar, (1997). *Mes’eletu Kurdistan (Doza Kurdistan)*, *Pêşkêşkirox: Îzedîn Mistefa Resûl*, çapa duyemîn, Beyrut.
- Silopî, Zinar. (1992). *Doza Kurdistan*, Pınar yayınları, Ankara.

Tahir, Tewfîq, Hogir. *el-Elifbau'l-Kurdiyye Bi'l-Hurûfî'l-Erebiyye We'l-Hurûfî'l-Latiniyye*, çapa yekem.

Yıldırım, Qedrî, (2005). Elîfbaya Xelîl Xeyalî, *Kovara Bîr*, Hejmar: 3, Payîz, Dîyarbekir.

**Analîzê Estanika "Waya Hewt Birayan"
Goreyê Îndeksê Motîfan Ê Stith Thompsonî¹⁶**

Waya Hewt Birayan Masalının Stith Thompson'un "Motif-
İndeks"ine Göre Analizi

Analysis Of The Waya Hewt Birayan Tale According To
Stith Thompson's "Motif Index"

Analîza Çîroka Waya Hewt Birayan Li Gorî "Îndeksa
Motîfan" A Stith Thompson

Murat BAŞARAN¹⁷

Kilmnus

Xebatê ke estanikan ser o virazeyayê heme miletanê cîhanî de sey komerdene estanikan dest pa kerdo. Arêdayişê estanikan ra tepîya persgireyê kategorîzekerdene û analîzî vejîyayo meydan. Na hewcedarî biya sebebê xeylê xebatanê îlmîyan ke estanikan ser o virazeyê. Kes eşkeno xebatanê Proppî, Aarneyî û Stith Thompsonî sey pêşengê nê xebatanê îlmîyan bimojno. Semedo ke motîf sey parçeyo tewr hurdî yê estanike yeno qebulkerdene na xebate zî estanika "Waya Hewt Birayan" goreyê Motîf Îndeksê ATUyî analiz kena û erjnena.

Kilîtçekuyî: Estanike, Motîf Îndeks, Zazakî, Waya Hewt Birayan

Kurte

Lêkolînên yekem ên li ser çîrokan bi komkirina çîrokên ji çar aliyê cîhanê dest pê kirin. Piştî hewldanên komkirinê, pêdiviya dabeşkirin û analîzkirina çîrokan derket holê; di vê pêvajoyê de, gelek lêkolînên zanistî derketin holê. Li gorî pêdiviya analîzkirina çîrokan, berhemên folklorîstên wekî Vladimir Propp, Antti Aarne û Stith Thompson derketin pêş; van lêkolîneran her wiha rê ji bo lêkolînên paşê re vekirin. Têgeha motîfê, yekîneya watedar a herî

¹⁶ Kilmnûsê na xebate, Kongreya Ziwannasî û Edebîyatê Pêveronayeyî ya Mîyanneteweyî (II) ya ke hetê Unîversîteya Artukluyî ya Mêrdînî (15-16 Gulane 2025) ra ameya organîzekerdene de sey pêşkêşî ameya pêşkêşkerdene.

¹⁷ Doktorant, Beşê Ziwan û Kulturê Kurdistan, Zaningeha Dicleyi, muradbasaran@gmail.com, ORCID: 0000-0003-4859-7443

biçûk a çîrokekê, di analîzên wiha de wekî hêmaneke bingehîn derdikeve pêş. Di vê lêkolînê de, li ser bingeha nêzikatiya navborî, çîroka Zazayan a bi navê "Waya Hewt Birayan" bi bikaranîna Indeksa Motîfan a Aarne-Thompson-Uther (ATU) wekî bingeh hatiye analîzkirin.

Peyvên Sereke: Çîrok, Indeksa Motîfan, Zaza, Waya Hewt Birayan

Özet

Masallar üzerine yapılan ilk çalışmalar, dünyanın dört bir yanında masalların derlenmesiyle başlamıştır. Derleme çalışmalarının ardından, masalların sınıflandırılması ve analiz edilmesi gerekliliği doğmuş; bu süreçte bilimsel nitelikte çeşitli çalışmalar ortaya çıkmıştır. Masalların analizine duyulan ihtiyaç doğrultusunda Vladimir Propp, Antti Aarne ve Stith Thompson gibi halk bilimcilerin çalışmaları ön plana çıkmış; bu araştırmacılar, kendilerinden sonraki çalışmalar için de yol gösterici olmuştur. Masalın en küçük anlamlı birimi olan motif kavramı, bu tür analizlerde temel bir unsur olarak öne çıkar. Bu çalışmada da söz konusu yaklaşımdan hareketle, Zazaca bir masal olan "Waya Hewt Birayan" adlı eser, Aarne-Thompson-Uther (ATU) Motif İndeksi temel alınarak analiz edilmeye çalışılmıştır.

Anahtar Sözcükler: Masal, Motif İndeksi, Zazaca, Waya Hewt Birayan

Abstract

The first studies on fairy tales began with the collection of tales from around the world. Following these collection efforts, the need arose to classify and analyze fairy tales; this process gave rise to various scientific studies. In line with the need to analyze fairy tales, the works of folklorists such as Vladimir Propp, Antti Aarne, and Stith Thompson came to the fore; these researchers also guided subsequent studies. The concept of motif, the smallest meaningful unit of a fairy tale, stands out as a fundamental element in such analyses. In this study, based on the aforementioned approach, the Zaza fairy tale "Waya Hewt Birayan" was analyzed using the Aarne-Thompson-Uther (ATU) Motif Index.

Keywords: Fairy tale, Motif Index, Zaza, Waya Hewt Birayan

DESTPÊK

Edebîyatê fekkî yê Zazayan, xususen hetê mîtolojî û folklorî ra xezîneyêka bê emsal a. Mîyanê nê edebîyatî de "estanikî" (sanekî) cayêko zaf muhîm gêne û vîrê komelî neqlê neslanê neweyan kenê. Estanikî, tena hedîseyê ke xeyalê însanan ra vejîyayê nîyê; eynî wext de kodê kulturî, bawerî û têkilîya însanan a bi gerdûnî ra zî nîşan danê.

Heta nika mintiqaya Zazayan de semedê arêdayîşê nê berhemanê fekkîyan xeylê xebatî ameyê kerdene. Labelê, eke ma nê xebatanê erjayeyan bidê verê çiman, ma vînenê ke xebatî zafêrî daraxê "arêdayîş û tomarkerdene" de mendê. Estanikê ke ameyê nuştene, goreyê metotanê zanistîyan ê mîyanneteweyîyan hîna tam nêameyê tehlîlkerdene û tesnîfkerdene. Halbîke dinya de hetê folklorî ra metodê sey Aarne-Thompson (ATU) estê ke nê metodî estanikanê miletanê cîya-cîyayan kenê têver û motîfanê înan ê gerdûnîyan vejenê meydan.

Goreyê (Karagöz, 2019)î, motîf "parçeyo tewr hurdî yê estanike" yo û estanike ser o viraştene analizêko raşt, tena bi tesbîtkerdişê nê motîfan mumkun o. Çünke temayanê estanikan cîya bibê zî, motîfî sey kerpîçanê binawanî yê û kultur ra kulturî nêbedilîyenê. Semedê neyî, ganî estanikê Zazakî zî goreyê sîstemê (Thompson, 1966) bêre kategorîzekerdene ke ma bişêyê cayê nê estanikan lîteraturê dinya de bivînê.

Na xebate de, estanika ke herêma ma de bi nameyê "Waya Hewt Birayan" (Keyneka Wayîrê Hewt Birayan) yena zanayene, goreyê sîstemê Stith Thompson's Motif-Index of Folk-Literature (MIFL) ameya analizkerdene. Eslê xo de, verê cû derheqê na estanike de (Aslanogulları, 2017) tehlîlêko "semiyotîk" kerdo û hetê nîşaneyan ra estanike erjnaya. Labelê ferqê xebata ma no yo ke; ma do na estanike hetê "motîfan" ra bi teferuat tehlîl bikerê û kodê aye yê mîyanneteweyîyan tesbît bikerê. Bi nê qaydeyî, hedefê ma o

yo ke ma nîşan bidê estanikê zazakî tewriranê (tîpê) estanikan ê dinya de kotî de ca gênê.

1. ÇARÇEWAYA MEFHÛMKÎ

Etudkerdişê vatişanê şarî yê daraxê cihanşumûlî de û tesbîtkerdişê cayê varyantanê mehelîyan lîteraturê dinya de, tena bi metodêko sîstematîk yê tesnîfkerdişî mumkun o. Na xebate de, estanika "Waya Hewt Birayan" ya ke kulturo fekkî yê zazakî ra ameya arêkerdiş, goreyê sîstemê Stith Thompsonî yê "Motif-Index of Folk-Literature" (Îndeksê Motîfan ê Edebîyatê Şarî), ke cigêrayîşanê şarnasîye de metodonê binyadkaranê tewr muhîman ra yew o, ameya analîzkerdiş. Tablo 1î de wendena motîfan ameya mojnayene.

Tablo 1 Nimûyê Wendena Motîfan

Nimûne	B181.1. Pisînga sêhrin. (Biew. B211.8, B422.)--BP 146f.; Norlind SkattsPrgrner, 47 n. 1; Îrlanda efsane: Haç
B181.1.	Mîyanê Îndks de hûmara motîfî
Pisînga sêhrin	Pênaseyê motîfî
BP 146f.	Hûmara motîfî ya ke şibêna nê motîfî
Îrlanda	Welato ke no motîf zêde yeno vînayene
Thompson-Balys.	Koleksîyono ke motîf mîyanê ci de yo

1.1. Sey Kerpîçê Binawanî yê Vatişî "Motîf"

Tehlîlkerdişê estanike de mefhûmê "tîp" û "motîf"î di estunanê bingeyênan pê anê. Pêroyîya estanike yew "tîp" (type) virazena; elemanê tewr hurdî, manadar û qalibgerdeyî yê ke nê pêroyî pê anê zî sey "motîf" yenê pênaskerdiş. Goreyê (Karagöz, 2019)î motîfî "kerpîçê binawanî" yê vatişî yê. Qehremanî, mekan yan zî plano peyên ê kulturî yê vatişî

bivurîyê zî, motîfî (mavajî "Bîr erzîyayîş", "hetkarîya objeyê efsûnî" yan zî "mucadele bi dêvî reyde") estîya xo pawenê û kultur ra kulturî rê gêrenê (Karagöz, 2019). Nê pabestî de analîzê motîfî, seba mojnayîşê nêzdîyîya binyadî ya estanikêka zazakî bi estanikêka Grimmî yan zî vatişê şarê Rusî reyde, wasitayo tewr objektîf o.

1.2. Sîstemê Tesnîfkerdişî yê Stith Thompsonî (MIFL)

Şarnas Stith Thompsonî, seba ke berhemanê fekkîyan ê pêroyê dinya (estanike, efsane, mît ûsn.) yew katalog de arê bikero, sîstemêko kodkerdişî yo alfabetîk û numerîk aver berdo. No sîstemo ke hetê Thompsonî ra formo peyên deyayo ci, letikanê vatişî A ra heta Z bi grûbanê herfan abirneno. Kategorîyê bingeyênî yê ke na xebate de ameyê xebitnayîş nê yê:

- **A. Motîfê Mîtolojîkî:** Afirnayîş û kokê ke teberra xozayî yê.
- **D. Sêhr (Magic):** Nesneyê efsûnî û bedilîyayîş.
- **F. Ganîyê Adetan ra Teber (Marvels):** Dêvî, cureyî, perîyî.
- **K. Xapênayîş (Deceptions):** Hîle (deke), remayîş û îsnad (îftîra).
- **P. Komel (Society):** Awaniya keyeyî, qiralîye, statuyê sosyali (Thompson, 1966).

Tablo 2 yî de binyada hîyerarşîke ya motîfan ameya mojnayene. Nê tabloyî ra kes eşkeno hîyerarşîya ke mîyanê motîfan de ya bikero tesbît.

Tablo 2 Binyadîya Hîyerarşîke ya Motîfan

B. Heywanî	Beşo Sereke
Bo-B99 Heywanê Mîtolojîkî	Koma Binbeşan
B10 Cinawir û Melezê Mîtolojîkî	Binbeş

B11 Ejderha	Motîf
B11.2. Formê Ejderhayan	Binbeşê motîfî yo yewin
B11.2.3 Ejderhaya Zafsereyin	Binbeşê motîfî yo dîyin
B11.2.3.1 Ejderhaya Hewt Sereyin	Motîfo Çime

Her yew motîf, bi hûmaranê ke kîştê nê herfan de yenê nuştene (Mavajî: F531. Dêvî) nasname beno. No metod, seke (Demir, 2016)î xebata xo ya serê estanikanê "Mîrze Mihemed"î de zî dîyar kerdo, sey pasaportêko akademîk o ke vîyartişê vatişanê meheliyan o mîyanneteweyî peyda keno.

1.3. Cayê ci yê Lîteraturî û Ferqê Metodolojîkî

Estanika "Waya Hewt Birayan" ya ke yena etudkerdene, vatişanê edebîyatê şarî yê zazakî ra yewêka tewr naskerde ya û varyantê aye zaf ê. Wexto ke lîteraturê serê na babete yeno cigêrayene, xebata (Aslanoğulları, 2017)î ya şamîle ya serê "Keyneka Wayîrê Hewt Birayan"î balkêş asena. Labelê Aslanoğullarıyî xebata xo de estanike daraxê "semîyotîkî" (nîşanenasîkî) de girewta dest; temerkuz kerdo serê analîzkerdişê remzan, kodanê kulturîyan û tebeqeyanê manaya mîyanê metnî.

Erja orjînale ya na meqaleye zî tam na nuqta de cîya bena. Xebata mewcûde, estanike daraxê manayî (semantîkî) ra vêşêr daraxê binyadî (morfolojîkî) de gêna dest. Rêza serebûtî ya estanike ameya parçekerdene, sîstemê (Thompson, 1966)î de muqabilê înan ameyê tesbîtkerdene û bi nê hawayî, katalogê cîhanşumûlî (sîstemê ATU û MIFLî) de cayê motîfanê vatişê zazakî ameyê şênberkerdene. No hawayê ewnîyayîşî, do rayîr akero ke estanikê zazakî xebatanê edebîyatê muqayeseyî de sey setê doneyan bêre xebitnayîş.

2. DESTKEWTEYÎ

Na xebate de, varyantê Sêwregî yê estanika "*Waya Hewt Birayan*" ke tradîsyonê (kevneşopîya) fekkî yê Zazakî ra ameya arêkerdene, ameya tehlîlkerdene. Rêza serebûtî ya estanike ameya parçekerdene, bi yewîneyanê mana yê tewr hurdiyan ameya cîyakerdene û goreyê sîstemê "Motif-Index of Folk-Literature" yê Stith Thompsonî ameya kodkerdene .

2.1. Xulasayê Estanike

Waya qije, hewt birayanê xo ra bêxeber a. Bi sebebêk dewijan ra musena ke hewt birayê aye estê û şîna maya xo ra birayanê xo persena. Maye, semedo ke a şîro hetê birayanê xo, weli ra aye rê yew her vîrazena; labelê tembe kena ke "ganî rayîr de qet nêvîndero". Keyneke kewena rayîr. Rayîr de rastê tayê ceribnayîşan yena û semedo ke herê xo dana vîndarnayene, her beno wele. Ceribnayîşê peyênî de rayîrê xo bi serkewtiş qedînena û resena cayê birayan.

Verî, xo nêmojnena birayan, dizdîye ra karê keyeyî kena. Birayî nê karî ra mat manenê û wazenê ke tesbît bikerê kam nê karî keno. Bi rêze ya hewt birayî nobete gêne û her fine rakewenê. Peynîye de birayo tewr qij, semedo ke nêrakewo, destê xo birneno, sole keno ci û nêrakeweno; bi no qayde ferq keno ke, a ya ke karî kena waya înan a. Birayî waya xo nas kenê û aye tembe kenê: "Kêberî kesî rê meakere û to çî werd, bide pisînga keyeyî zî." Vanê, eke to nêda pisînge, pisînge do adirê keyeyî hewnakero.

Rojêke keyneke vîr ra kena ke werdişê xo ra bido pisînge û pisînge zî adirî kena hewna. Keyneke bi telaş vejîyena teber û şîna ver bi ocaxê ke dûyê ci ra vejîyeno. Keyneke şîna ke o keye, keyeyê dêwan o. Uca de hewt keyneyanê ke maya înan dêwa, vînen a. O wext "Cinêka Dêwe" (maya înan) yêna û wazena ke keyneke biwero. Peynîye de vana "Ya bêçika xo bide ez bimija yan zî ez do birayanê to bikişî". Keyneke mecbur manena û qebûl kena. Semedo ke bêçikê aye yenê mijnayene, keyneke roj bi roj zeîf kewena. Birayî na rewşe ferq kenê. Netîce de, birayî hedîse musenê, Dêwe kişenê û hewt keynekanê aye reyde zewicîyenê.

Wext ravêreno, keyneka qije hewt veyvanê (cinîyanê birayanê) xo reyde manena. Veyvî, kînê maya xo ra, zereyê werdişê keyneke de marêkê qiji nanê ro. No mar zereyê pîzeyê keyneke de beno pîl û pîzeyê aye maseno. Dima hewt veyvî keyneke rê îffîra erzenê û vanê "A, rayîrê xirabî ra hemîle menda".

Birayan ra birayo qij, semedê kiştişê waya xo, aye beno daristane; labelê nêşeno bikişo (zerrîya ci nêdana), aye serbest veradano û agêreno. Keyneke, peyê birayê xo de zewtî dana û vana: "Paşna to de telîyêk bivejîyo, dermanê ci tena mi de bo". Dima keyneke rastê mêrdeyêko rindî yena; o mêrde marê zereyê aye vejeno û aye reyde zewicîyeno.

Serrî ravêrenê, yew camêrd (o birayo qij) bi derdê telîyê linga xo gêreno û yeno dewa ke keyneke tede ciwîyena. Keyneke lajê xo erşawena hetê ê camêrdî û yew peyama şîfreyin dana ci. Netîceyê peyame de, camêrd fam keno ke; o ke ameyo lajê warda ey o. Keyneke birayê xo derman kena, çîyo ke qewimîyayo ey rê vana û pîya agêrenê. Birayî, cinîyanê xo kişenê û waya xo reyna kenê tacê sereyê xo.

2.2. Motîfê ke Mîyanê Estanike de Ca Gêne

Nê beşî de motîfê ke ameyê tesbîtkerdene, bi hawayêko ke îskeletê binyadî yê estanike virazenê, cêr de ameyê tesnîfkerdene.

2.2.1. Çîyo Sêhrin û Heywanî

Beşê destpêkî yê estanike de, unsurê nexozayî (ser-tebîî) yê ke herikîyayîşê serebûtan bedilnenê, ameyê tesbîtkerdene.

- **D1246. Hero Sêhrin (Dara Sêhrine):** Estanike de maya kêneke, leteyê (parçeyê) darêka efsûnkare ra çîyên virazena.
- **B170-B189. Heywanê Sêhrinî:** No çîyo ke maye bi malzemeyo sêhrin ra viraşt, beno her.
- **B296. Heywanan reyde Seychet:** Qehremana cinîye ya estanike (waye), semedo ke birayanê xo bivîno, nê herê sêhrinî sey wesayît şuxulnena.

2.2.2. Qedexeyî û Mecburîyetî (Tabûyî)

Qaydeyê ke qehreman ganî riayet bikero û binpaykerdişê nê qaydeyan, estanike de beno sebebê pêkewtişî (konflikt).

- **C600-C699. Ganîyîyê (Mecburîyetî):** Pêvajoya raywanî û resayîşî de di ganîyîyê (mecburîyetê) bingehînî yê ke ganî waye riayet biko, ameyê dîyarkerdene:

-Heta ke bireso hetê birayanê xo, ganî herê ke ser o yo qet nêvindarno.

-Wexto ke resa keyeyê birayanê xo, çi werd ganî pisînga keyeyî zî bido werdene.

- **C751. Tayê Wextan de Qedexeyî:** Wexto ke birayî keye de nîyê, ameyo qedexekerdene ke waye keyberî (berî) kesî rê nêakero. Binpaykerdişê nê qedexeyî, semedê kewtişê karakteranê xiraban beno zemîn.

2.2.3. Ganîyê Nexozayî û Kesê Zaf Qewetînî

Hêzê reqîbî (antagonîstî) yê estanike û taybetmendîyê qehremanan bi nê motîfan ameyê pêşkêşkerdene:

- **F531.0.4. Ciniya Dêwe:** Maya hewt keynekanê ke hewt birayî înan reyde zewicîyayê, şeklê însanî de nîya, şeklê dêwe de ya.

- **F531.6.8.6. Gedeyê (Domanê) Dêwe:** Hewt keynekê ke cinîyê birayan ê, gedeyê na Ciniya Dêwe yê.

- **F610. Însanê Zaf Qewetînî:** Hewt birayê kêneke, karakterê winasî yê ke wayîrê qewetê fizîkî yê û eşkenê yew dêwe bikişê.

2.2.4. Xapênayîş, Îsnadkerdiş û Serebûtê Nexozayî

Estanike, bi açarnayîşê serebûtêkê ke nêmantîqî yo (mantiqin nîyo) ver bi amûrê îsnadî (îftîra), şekil gêna.

- **F900. Serebûtê Îstîsnayî:** Cinîyê birayan (veyvî), awe danê keyneke. Badê şimitena awe pîzeyê keyneke nişka ra maseno û sey digane asena. No hal bîyolojîk nîyo, serebûtêko nexozayî (ser-tebîî) yo.

- **K2213. Ciniya Xayine / Ciniya İsnadkare:** Ciniyê ke keyneyê dêwe yê, gorima (waya mêrdeyî) xo rê îsnad (botan) kenê û wazenê ke aye çimê birayan ra bivisnê.
- **K2213. Ciniya ke bi Bêehlaqîye Yena Sûcdarkerdene:** Pindusayîşê (masayîşê) nexozayî (F900) ke ame meydan, hetê ciniyanê xayinan ra sey delîlê bêîfetiye yeno nîşandayene û keyneke bi bêehlaqîye yena sûcdarkerdene.

2.2.5. Motîfê Bînî

- **M430. Zewte (Nifir):** Kêneka ke îsnad (îftîra) ameyo kerdene ci, vera na neheqîye de birayê xo rê zewte (nifir) kena.
- **Z71.5. Hûmarê Formulîstîkî (7):** Rêza serebûtî ya estanike de hûmara "hewt"î wezîfeyêko awaker gêna (Hewt birayî, hewt keyeyê dêve ûsn.).

3. NÎQAŞ Ê ENCAM

Na xebate de, varyantê Sêwregi yê estanika "Waya Hewt Birayan" ke berhemanê muhîman ê tradîsyonê (kevneşopîya) fekkî yê Zazakî ra yew a, goreyê sîstemê "Motif-Index of Folk-Literature (MIFL)" yê Stith Thompsonî ameya tehlîlkerdene. Encamê analîzî de, rêza serebûtî ya estanike ameya parçekerdene, bi yewîneyanê mana yê tewr hurdiyan (motîfan) ameya cîyakerdene û muqabilê nê motîfan katalogê mîyanneteweyî yê estanikan de ameyê tesbîtkerdene. Vînayîşê ke ameyê destvistene, çarçewaya taybetmendîyanê binyatîyan ê estanikanê Zazakî de û têkiliya înan a bi lîteraturê dinya de cêr de ameyê nîqaşkerdene.

3.1. Asayîşê Unîversal û Herêmi yê Estanike

Motîfê sey D1246 (Çîyo Nexozayî), F531 (Dêwî) û K2213 (İsnadkerdiş) ke encamê tehlîlî de ameyê tesbîtkerdene, nîşan danê ke na estanike tena hikayeyêka herêmi nîya; eksê ci, rêza serebûtî ya unîversale (cîhanşumûle) reyde (xusûsen tîpê ATU 451 reyde) paralellîyêka binyatî ya xurte esta. Nê esasî ser o, rêzebîyayîşê motîfan ê estanika "Waya Hewt

Birayan", îspat keno ke tradîsyonê (kevneşopîya) fekkî yê Zazakî yo ke seserran ra na het dewam keno, qalibê tehkîye yê unîversalî (remayîşo nexozayî, qedexe, îsnad û xelasbîyayîş) bi serkewtişî pawitê.

Labelê, tayê motîfê ke nê îskeletalê unîversalî ser o berz benê, bi kodanê kulturîyan newe ra şekil girewto. Xususe, beşê çareserîye yê estanike de motîfê "Zewte" ke bi kodê M430 yeno nîşandayene, varyantêko kulturî yo xoserî temsîl keno. Tîya de qehremana estanike (waye), qurbanêka pasîfe ra vejîyena û bi qewetê vatişî (bi rayîrê performatîfî) edaletî ana ca.

3.2. Hewcedariya Tesnîfî û Katalogkerdişî

Xebatê ke derheqê lîteraturê (edebîyatê) fekkî yê Zazayan de ameyê kerdene, zafêrî sewîyeya "arêkerdişî" de mendê û xebatê tesnîfî yê analîtîkî sînorkerde yê. Labelê kewtişê berhemanê fekkîyan ê yew şarî mîyanê lîteraturê dinya, tena bi indekskerdişê sîstematîkî mumkun o. (Demir, 2016), tezê xo yo ke estanikanê Kurmanckî ser o viraştê de dîyar keno ke indeksê motîfan semedê tehkîyeyanê (vatişanê) herêmîyan wezîfeya "pasaport" vînenê û xebatê pêveronayîşî (komparatîst) tena serê nê kodan ra eşkenê bêrê kerdene.

Envanterê motîfan o ke na xebate de ameyo averberdene, nîşan dano ke estanikê Zazakî mehsulê xeyalî yê tesadufî nîyê; eksê ci, nê estanikî eşkenê kategorîyanê sey B (Heywanî), C (Qedexeyî) û P (Kemel) de bêrê sîstematîzakerdene. Tetbîqkerdişê metodê Stith Thompsonî, semedê arêkerdişê kullîyatê estanikanê Zazakî yê vilakerdeyan û viraştişê "Katalogê Estanikanê Zazakî" zemînêko metodolojîk pêşkêş keno.

3.3. Encam

Sey encam; estanika "Waya Hewt Birayan", hem bi motîfanê xo yê unîversalan (cîhanşumûlan) îspat kena ke, a şaxêka dara estanikanê dinya ya, hem zî bi motîfanê xo yê herêmîyan (Zewte, rolanê komelkîyan) binyadê xoserî yê

kulturê Zazayan mojnena. Na xebate îspat kena ke, estanikê Zazakî tena mecbur nîyê ke "bêrê tehkîyekerdene"; eynî wext de ganî bi metodanê zanistîyan (îlmîyan) bêrê tehlîlkerdene û bêrê tesnîfkerdene. Xebatanê ameyoxan rê pêşnîyaz beno ke, herinda (cayê) analîzanê estanikanê yewinan, xebatê kataloganê tîp û motîfan ê ke varyantanê cîya-cîyayan zî mîyanê xo de heweynenê bêrê kerdene.

ÇIMEYÎ

Aslanogulları, M. (2017). Keyneka Wayerê Hot Birayan Sera Tehlîlêko Semiyotik. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi Cilt:3 Sayı:5*, 93-111.

Demir, B. (2016). Çîrokên Kurdî Li gorî Motîf Îndeksa Stith Thompson– Bi Nimûneyên Çîrokên Mîrze Mihemed. *Tezê Masterî yo Nêweşaneyaye*. Mêrdîn: Zanîngeha Mardîn Artukluyê.

Karagöz, D. E. (2019). Motif-Index of Folk-Literature Kullanımı ve Karşılaşılan Bazı Sorunlara Çözüm Önerileri. *Milli Folklor* 124, 75-90.

Ö***, R. (2025). Estanika Waya Hewt Birayan [Qeydê Vengî, hetê M. Başaranî ra ame qeydkerdene]. *Sêwregi*.

Thompson, S. (1966). *Motif-Index of Folk-Literature: A Classification of Narrative Elements in Folktales, Ballads, Fables, Mediaeval Romances, Exempla, Fabliaux, Jest-Books and Local Legends*. Indiana: Indiana University Press.

ÎLAWEYÎ

ESTANIKA WAYA HEWT BIRAYAN

Zemanê estbi, jew keyneki û jew maya xo estbî. Keynekê dewî ronîştîbî şehriye birnayêne. Verê şehriye estbi û birnayêni. Wextê ronîştîşî di keynekan xwu no kişt lûna o kişt lûna a jewî va kewti ver. Ayî va to kerdo a bînerî va to kerdo. Ayî va seredê birardê mi bo ki mi nêkerdo nayî va seredê birardê mi bo ki mi nêkerdo jew keyneki zî nameyê ci Fatîma bîya. Va bi seredê golikdê min ê belekî bo ki mi nêkerdo. Keyneyê bînî vanê keynê hewt birayê to yê keleşî estê. Ti ya çi birayanê xwu nêvana, ti ya çi vana seredê golikdê ma bo?

Keyneki şîna keye marda xwu ser o bermena. Vana dayê hewt birayê mi estê to çi rojên mi rê nêvato. Maya ci vana e keynaya mi hewt birayê to estê. Labrê bol dûrî dê ti nêresena ci. Vana mi rê vajî ez o şîra biraranê xwu bivîna. Maya ci vana temam ez o to birişa. Ez o to rê herri ra herekê viraza. Cinêki ci rê herra herekê virazena û vana labrê ti do qet hoş nêvajê, ti do timûtum vajê ço! Keyneki şîna-şîna cayê di erdo mûrekê vînena. Vana hoş ki herekî vindarno mûreki bigîro. Senîn ki vana hoş herekê ci beno weli şehtëno. Keyneki fina bermena û ageyrena keye. Vana dayê hereki mi bi weli. Maya ci vana oxil mi to rê va ti do tim ço kerê! Vana mi rê jewnayî virazî. Maya ci ci rê jewnayî virazena. Keyneki xeylê şîna no fin xwu rê ray ra altûnekê vînena. Herektê xwu rê vana hoş ki altûnî bigîro hereka ci fina bena weli. Keyneki fina ageyrena marda xwu ser o bermena. Vana dayê ti do mi rê jewna virazê. Mayek ci rê jewnayî virazena vana keynaya mi no fin tim birami qe mevajî hoş. Keyneki nişane hereki û timûtîm van ço! ço! û şîna.

Winêna ke qonaxekêno sipe yo, o yo baxçan mîyan di. Kêberî cenena kes nêakeno. Kêberî akena şîna zerre ki keye pêro pêmîyan do, keye pêro leymin o û na kewna zerreyî tertemîz kena, înan rê şam- mamîyeki kena û keyneki xwu

nimnena. Şan di birayç ci yenê. Birayî vanê la karê ma bîyo, no kam ameyo keydê ma? No cin o cinawir o? Vanê ma do ney bipawê. Meştêrî kenê şîrê seyd birayê girdî rê vanê ti bipawi hele no kam o ameyo kar û barê ma kerdo? Birayo gird maneno, xeylê maneno badê dihîri hewnê ci yeni rakewno. Rakewno tepîya na keyneki vijyêna dest û doşîyanê xwu weşanena fina ê kar-marê înan kena, şamîyeki kena nanekê înan hazir kena û birayî yenê. Vanê birayê mi to çi çi dî? Birayo gird vano willi mi çîyên nêdî. Ez raketbîya mi çîyên nêdî. No fin o jewo bîn vano ez o ewro bimana. O jî maneno o jî xeylê roşeno winêno hewnekê ci ame o jî rakewno. Fina wayî vijêna çorçoşmeyê înan temîz kena kar-marê xwu kena û şamîya xwu kena û xwu fina nimnena. Beno şan birayî yenê vanê biray mi to çi çi dî? Vano wellay mi çîyên nêdî. Ez rakewta. No fin birayê hîrin vano ez o ewro bimana. O maneno o jî fina o hesaba rakewno. Fina keyneki werzena şam-mamîya înan virazena û şan di fina xwu nimnena. Nê birayî yenê vanê la biray mi to ewro çi çi dî? To kam dî? Vano willi mi kes nêdî, ez jî zey şima ya rakewta. No fin birayê çeharî maneno. Ê çeharî jî o hesaba rakewno waya xwu nêvînenê. Birayî fina yenê arêbenê pê nan-manê xwu wenê vanê vira to kam dî? No kam yeno nê karê ma keno. Vano biray mi, mi jî nêdî. No fin ê panjî maneno a roji o jî rakewno o jî çîyê nêvîneneno. Keyneki fina werzena kar-marî kena û xwu cayêno mezbût di nimnena. Birayî yenê pers kenê ki o jî rakewto. Vanê la bira ti çi rê rakewtî? Bi no hesaba heme rakewnê û çîyên nêvînenê. Roja bîni qijê birayan vano ez o ewro bimana. Pêro şîne qij winêno hewnê ci yo yeno, engîşt a xwu birneno û soli keno po. Şeklê hewnî dano xwu û winêno ki keynekê vijyê ki winî xasek a ki, a vana ez, aşmî vana ez, hendo ki xasek a. Lajek rehet perreno ci vano ti kam a? Ti cin a, ti cinawir a, ti çi usn a, ti çi cîsn a? vano ti keynay kê ya? Ti koti ra amaya? A vana ki, ez waya şima ya, ez Fatîma ya. Vana Hal û mesela mi wina ya û ci rê heme çi yê xwu vana. Vano tamam waya mi. Senîn ki birayî yenê birayo qij vano la mijdîyana mi şima rê la waya ma amaya. Pê ya roşenê, kêfê înan beno weş. Çend rojî winî ravêrenê. Vanê wayê bewnî, pisîngêna ma est a. Ti çi çi bûrê, ti çi çi virazê gerek ti bidê a pisîngeri. Winî nêbo a do şîro adîrganî di mîza xwu bikero. Ê

jî kozê adirê xwu nimnenê ki şan di adirê înan nêşiro hewna. Keyneki hebêna eşkiji wena nêdana pisîngerî. Pisîngî zî ci ra hêrs bena û şina mîza xwu verdana adirganî û adirî kena hewna. Keyneki şina winêna ki adir şîyo hewna û adir çinî yo. Vana ez a se kera? Wextê şanî yo, birayê do bîrê û mi şamî nêkerda. Na finê vijêna qonaxi ser winêna qonaxêna dûrî di dîwênê winî barî yo ci ra werzeno. Na keyneki xwu weşanena ha babam ha remena-remena şina winêna ki hewt warî yê ronîştê ê yê kar kenê. Vana qandê Ellayî tayn adir bidê mi ez şira şamî bikera. Birayê mi şinê seyd bîrê ki şamî çinî ya. Nê werzenê tayn adir danê ci û vanê bewn labelê ti do şîrê wa kes to nêvîno. Maya ma dêw a. Bîro ki to bivîno a do zirar bido to, to bikişo. Keyneki werzena şina. Na maya nê keynan yena winî boy ancena vana keynêno ê vanê ha. Vana ewro kam ameyo tîya. Ê vanê kes nêameyo. Vana boya xeriban a keydê mi ra yena mi rê doxrî vajê. Ê jî vanê hal û mesela wina ya. Na pîrî kewna ray û şina. Şina kêberî cenena, keynek vana kam o a vana kêberî aki. Keyneki vana emrê birarandê mi esto ez nêwetana kêberî akera. Biraranê mi vato kêberî maki! Pîr vana ey ti nêakena engîştêna xwu kêberî ra veji mi mojîni.

Keyneki giştî xwu vejena dêw giştî ci kena xwu feki lêna-lêna-lêna zerrîya keyneker vêrena û keyneki xewirêna. Şan di birayê ci yenê ki waya înan erdo ya, na şamî bîya ne nan bîyo ne çîyê bîyo. Di rojî hîrê winî verenê. Jew bira vano vindi ki ma nayî bipawê. Biraran ra jew waya xwu paweno winêno ki a pîra dêwi roji bi roji yena keyneker rê vana engîştî xwu veji ez pi ro bilawî. Nêbo ez o to jî bikişî birayanê to jî bikişî. No bira pîrî tepşeno û kişeno. Wayî hal û mesel biraran rê vana, biray çinê qonaxa dêwi ki hewt wayî estê. Her bira jew wayî gêno pa zewijêno. Na wayî zî bena xatûna înan. Birayî vanê waya ma ti do karê nêkerê. Cinîyandê xwu rê zî vanê şima do warda ma rê bêsilme-yî bikerê. Rojê keyneki ronîştî, vana ez bîya teyşan. Biracînîya ci ya werdî, a qîja ci vana vindi ki ez şira to rê awî bîyara. Winêna ki pîrmahrekêno werdî o yo awî mîyan di. Kuwa xo nana ver a o mar kewno kuwer mîyan. Na yena vana ha Fatîma mi to rê awî ardi. Keyneki a kuwerî kena xwu ser di o mar kewno pîzedê keynker. Roji bi roji mar pîzedê keyneker di beno

qalın pîzeyê keyneker zî maseno. Birayî vanê xeyr o, se bîyo na warda ma? Biracînî heme qala xwu kenê jew û vanê waya şima winîhal a, hamîle ya. Vanê la waya ma zerre da, kesî nêvînenê senîn hamîle ya?

Wîja di nê vanê ma do berê wara xwu bikişê. Birayê înan o qij waya xwu nano herek ser û gîno beno cayêno dûrî. Ray ra edizênê wayeki nêweş a. Vana birayê mi a na dara tuwêr hetî di vîndî, hem êynî yo. Bira seya dara tuwêr di derg beno û sereyê warda xwu nano xwu saqî ser û wayî rakewna. Senîn ki rakewna birak sereyê ayî jew sî ser o roneno û terk keno û şîno. Destê ci, ci ra nêbeno wayeka xwu nêkişeno. Keyneki çîmanê xwu akena ki bira çînî yo. Fina bena derg jew mar yeno veyndano maro ki pîzedê ayî di. Vano la bivjî-bivjî dinya weş o, la çî rê to zerrîya a feqîrî qedînaya. Va vano la tîya deha weş o, zerrî ya qesba ya gurçikî yê ez a wena. Marê teberî vano ey la maro, maro, êki keyneker bizanayê siska hewt serran biwerdayê ti do lete bîyayê û fektê ayî ra bîameyê. Na keyneki hemî aşnawena. Keyneki vana ya Rebbî ez o se ra şîra. winêna ki merdimêno wina minasib yeno şîwane yo. Vano oxil ti û tîya? Ti kam a? Vana willî ez nêzana ez kam a. Birayê mi ez arda tîya verdaya û şîyo. Nameyê mi Fatîma ya. Keyneki meselaya xo heme ci rê vana. Vana mar o mi pîze di, biraranê mi vanê qey ez winî hal a, ez arda tîya de salme kerda û şîyo. Mêrdek vano hadê ez o to bera keydê xwu, ez o to rê siska hewt serra bîyar, êki mar bo o do bivijyo. Xora ti do ci ra bireyê. Winî nêbo ez o to salmekera. Êki o mar bivijyo ez o to bigîra. A wîja de o mêrdek şîno ci rê siska hewt serran ano dano ci. Keyneki wena mar beno lete lete keyneki marî virêjena. No mêrdek a keyneker gêno. Qeçekî ci ra benê.

Wexto ke no bira terkê warda xo keno şîno, na ci rê zewtî dana. Vana:

Birawo, birawo!

Tî şîrê dîyarê keyawo

Lînga to kewo hesteyê marawo

Heta derzîna mi pa nêbo o este ci ra nêvijyawo

Na zewta keyneker qebul bena. No bira şino dîyarê keyan, winêno çîyekê şî ci lingi ra no kişt o kişt o heste tede maneno. Sera şino çare çînî yo.

Nê birayî birarê xwu çarnena şinê dewa ki waya înan wîja der a. şinê a deweki. Qeçê keyneker şinê keye marda xwu rê vanê dayê jew ameyo seqet o, linga ci pêro masa ya. Keynek şina birayê xwu silasnena. Veyndana yenê keydê ci, derzîneka xwu gêna bismîllahîrehmanîrehîm vana, a dirbeta ci aşanena û hestekê marî ci ra vejena. Lajek vana oxx, mi rehet kerdi. Birayî pers kenê wakê ti kam a? Wayi xwu dana silasnayîş. Wîja de heme çî birarandê xwu rê vana. Vana ez hamîlê nêbîya cinîyanê şîma mi rê wîna kerdi. A nê birayî waya xwu gênê şinê, hewt heme cinîyanê xwu kişenê. Û estanika ma tîya di qedêna (Ö***, 2025).

Tablo 3 Motîfê ke Estanike de Ameyê Tesbîtkerdene

Kodê Motîfî (MIFL)	Kategorî	Nameyê Motîfî	Estanike de Senîn Vêreno
D1246	Sêhr (Magic)	Hera Sêhrin (Magic Wood)	Maya keyneke, perçeyêkê dara sêhrine ra yew her (ker) virazena.
B170-B189	Heywanî (Animals)	Heywanê Sêhrinî (Magic Animals)	Dara sêhrine bena yew heywanê sêhrinî (her).
B296	Heywanî	Heywanan reyde Seyehet	Keyneke semedo ke birayanê xo bivîno, hera sêhrine reyde kewena rayîr.
C600-C699	Qedexe (Tabu)	Mecburîyet (Compulsion)	Ganî keyneke rayîr de hera xo nêvindarno; çî werd ganî bido pîşînga keyeyî zî.

C751	Qedexe	Qedexeyê Wextî	Wexto ke birayî keye de nîyê, ganî kêberî kesî rê nêakero.
F531.0.4	Ecêbî (Marvels)	Cinêka Dêwe (Giantess)	Maya hewt veyvan (cinîyan), şeklê însanî de nîya, yew Dêwe ya.
F531.6.8.6	Ecêbî	Gedeyê Dêwan	Hewt cinîyê ke birayan de zewicîyayê, gedeyê Dêwe yê.
F610	Ecêbî	Însanê Zaf Qewetînî	Hewt birayê keyneke wayîrê qewetê pîlî yê û Dêwe kişenê.
F900	Ecêbî	Serebûtê Îstîsnayî	Badê şimitena awe, pîzeyê keyneke maseno û a sey digane (hemîle) asena.
K2213	Xapênayîş (Deception)	Cinîya Xayine / Îftîra	Veyvî, waya mêrdeyê xo rê botan erzenê (îftîra kenê) û vana a bêehlaq a.
M430	Lanetî (Curses)	Zewt / Nifir (Curse)	Keyneke vera neheqîye de birayê xo rê zewt (nifir) kena.
Z71.5	Formulîstîk	Hûmara 7 (Hewt)	Estanike de hûmara 7î (hewt birayî, hewt keyeyî) zaf rey ravêrena.

Berawirdîya Çar Hêmanan (Agir-Av-Ax-Hewa) Di Dîwana Rûhî û Heyderî Da

Comparison Of Four Elements (Fire-Water-Earth-Air) In The Dîwans Of Rûhî And Heyderî

Eşref Buran¹⁸

Kurte

Agir, av, ax û hewa wekî çar hêmanan ji felsefeyê bigire heta edebîyatê bûye mijar û tişteya gelek disîplînan. Taybetî di edebîyata klasîk da ev çar hêman hem bi awayekî rasterast hem jî bi rêya şibandin, pirolekirin, berawirdîyê bûne sembolên bikêr. Ji Melayê Cizîrî heta bi Ehmedê Xanî, Siyahpoş û Exlatî gelek helbestvanên kurd ev çar hêman di helbestên xwe da bi awa û wateyên cuda bi kar anîne. Rûhî û Heyderî jî şopa pêşîyên xwe gerandine û wan jî ev çar hêman di helbestên "Dîwan"ên xwe da emilandine. Di vê xebatê da awayên bikaranîna van çar hêmanan, hevyeke û cudatîyên di her du dîwanan da hatine vekolîn.

Peyvên sereke: Rûhî, Aqtepî, Heyderî, Ehmed, çar hêman (agir-av-ax-hewa)

Abstract

Fire, water, earth and air as four elements from philosophy to literature have been the theme and subject of many disciplines. Especially in classical literature these four elements have become practical symbols both directly and through likening, exaggeration, comparing. Many Kurdish poets, from Melayê Cizîrî to Ehmedê Xanî, Siyahpoş and Exlatî, have used these four elements in their poems in different ways and meanings. Rûhî and Heyderî also traced their predecessors and they used these four elements in their poems "Dîwan". In this work, the ways of using these four elements, the similarities and differences between the two "Dîwan" have been investigated.

¹⁸ Xwendekarê doktorayê, li Beşa Ziman û Edebîyata Kurdî ya Zanîngeha Dicleyê. e-meil: esrefkeydanî@gmail.com.

Key words: Rûhî, Aqtepî, Heyderî, Ehmed, four elements
(fire-water-earth-air)

Destpêk

Şêx Evdirehmanê Aqtepî helbestvan û kesayetekî giring yê edebîyata kurdî ya klasîk e. Ew ji gundê Aqtepeya Dîyarbekirê ye û piştî wî Aqtepe bûye navendeka îlm û îrfanê. Aqtepeyî li pey xwe gelek berhemên giranbiha hiştine. Wî li ser evîna îlahî, kesayetên dînî, xweza û civakê helbest nivîsîne. Di vê sedsalê da wekî Şêx Evdirehmanê Aqtepî gelek helbestvan derketine ji medreseyên Kurdistanê. Mela Ehmedê Heyderî jî yek ji wan helbestvanan e. Mela Ehmedê Heyderî ji herêma Serhedê ye û li gelek bajarên welatî gerîyaye. Wî di jîyana xwe ya kurt da -50 sal-kariye ku berhemên baş biafirîne. Di vê xebata xwe da em dê diwanên her du helbestvanan berawird bikin ji alîyê bikaranîna çar hêmanan ku jê ra “anasiri erba” tê gotin. “Anasiri erba ew çar tişt in ku hemû heyberên dinyayê ji wan xuliqîne.” (Pala, 2020:23). Em dê awayê bikaranîna van çar hêmanan vekolin, hevyeke û cudabûna bikaranînan raxin ber çavan.

1. Jînenîgarî û Helbestvaniya Rûhî û Heyderî

Ji bo ku vekolîn û analîzên baş li ser berhemên berhemdaran bînin kirin pêdivî pê heye ku mirov bizane ka berhemdarê berhemê kengî, li ku û di nava atmosfereka çawa da jîyaye. Zanîn û nasîna jîyana nivîskarekî/ê mij û morana li ser berhemê dide alî, pê rêya vekolînê xweş dibe. Di vê beşê da em dê berê xwe bidin jînenîgarî û helbestvaniya her du helbestvanan.

1.1. Jînenîgarî û Helbestvaniya Rûhî

Navê rast yê Rûhî, Evdirehman e û “êvareka îniyê ya sala 1853ê hatiye dinyayê.” (Yildiz, 2020:7). Li ser dîroka jidayikbûna wî hin lêkoleran fikirên cuda berpêş kirine. Aslanoglu (2020) gotîye sala 1842ê welidîye, Özaydın (2008:45) jî sala 1854ê destnîşan kirîye. Adak (2017:493) jî sala ji dayikbûna wî wekî 1853 danîye. Evdirehman, lawê Şêx Hesênê Nûranî ye. Şêx Evdirehman li ber destê bavê xwe perwerde bûye “pişt ra ji bo xwendina xwe temam bike ewil li Iraq û Surîyeyê û dûre li gelek medreseyên din jî xwendiyê û piştî xwendinê, vegeirîyaye gundê xwe. Dema ku bavê wî wefat dike, wî li medreseyê seydatî kiriye

û dersên medreseyê dane” (Yildiz, 2020:7). Ev medrese û tekya ji aliyê pêşiyê malbata Aqtepiyan Şêx Hesênê Nûranî (1863) ve hatiye damezirandin. (Adak, 2017:492) Piştî demekê Şêx Evdirehman dev ji dersdarîyê berdaye û rêvebirina medrese û tekyayê dewrî birayê xwe Şêx Mihemed Can kirîye. Şêx Evdirehman di helbestvanîya xwe da nasnavên wekî Rûhî û Şemsedîn bi kar anîne. Adak di gotareka xwe da agahîyên giring derbarê nasnav û kesayetîya helbestvanî da dide. “[N]avê helbestvan Ebdurehman, leqeba wî Şemsedîn, mexlesa wî ya helbestê Rûhî, gundê wî Aqtepê, mezhebê wî yê fiqhî Şafîî, mezhebê wî yê îtîqadî Eş’erî û terîqeta wî ya tesewîfî jî Neqşîya Xalidî ye.” (2017:494).

Li gorî neqilkirina Özeydînî (2008:69-76) Şêx Evdirehman li pey xwe 13 berhem hiştine. Ji bo xebatên kurdî giringtîrîn berhemên wî Rewdunne’îm û Dîwana wî ne. Rûhî, sala 1910ê di 57 salîya xwe da wefat kirîye û gora wî li Aqtepeyê, li cem gora bavî wî ye. Adak (2017) Rûhî wekî damezirînerê ekola Aqtepeyê dihesibîne, li pey wî ji vê malbat û ekolê helbestvanên mezin derketine yên wekî Şêx Mihemed Can, Şêx Mihemed Kerbelayî, Şêx Mihmed Eskerî, Şêx Hesîb.

“Şêx Ebdurrehmanê Rûhî helbestvanekî girîng û dahêner ê serdema piştî mîrektîyan e. Çi di tema û mijaran de, çi di şêwazên edebî û hunera helbestê de be ferq nake ew di edebiyata kurdî ya klasîk de xwedîyê gelek dahênanên edebî ye û gelek peyrew li pey xwe hiştine. Bi rehetî dikare bê gotin ku di serdema piştî mîrektîyan de li Bakur helbestvanekî di yê bi qasî wî orjînal û xwedî bandor tune. ” (Adak, 2017:491). Helbet sedemên vê bandora wî hene ku yek jê ew serwextê helbesta berîya xwe ye û helbestvanên berîya xwe yên mîna Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Feqî baş nas dike û wî ji kanîya helbesta wan ava helbesta kurdî vexwarîye. Herweha ew zimanên cîran yên li Rojhilata Naverast jî zehf baş dizane û li cihinan sûd ji wan zimanan jî girtîye. Aslanoğlu (2019b) jî di gotareka xwe da bal kişandîye ser berhemdarîya wî ya pîrzimanî. Wî di helbestên xwe da qalib û mijarên edebîyata klasîk ji xwe ra kirine bîngeh û ew di bikaranîna hunerên edebî da jî zehf şareza û jêhatî dixuyê. Aqtepî bi hin ceribandînan xwe jî bûye pêşeng. Ertekîn amaje bi helbesteka wî dike û dibêje, “Di edebiyata kurdî ya klasîk de

xwediyê yekem le'netnameyê Şêx 'Ebdurrehmanê Aqtepî ye.” (2019).

Şêx Evdirehmanê Aqtepî Dîwana xwe sala 1876ê nivîsiye û di vê Dîwanê da 29 helbest û 471 beyt hene. Ji van 29 helbestên di Dîwanê da 3 jê bi farisî ne, yê din bi kurdîya kurmancî ne. Mijara sereke ya Dîwana wî evîna îlahî ye. (Aslanoglu, 2019a:659).

1.2. Jînenîgarî û Helbestvaniya Heyderî

Mela Ehmedê Heyderî bi esilê xwe ji Serhedê ye lê emirê wî bi ger û rêwîtiyê borîye. Di çaryeka dawîn ya sedsala 19. da dinya dîsa li bin guhê hev ketibû. Di wan salan da ku mij û moranê xwe bi ser welatê kurdan da berdabû, li hêlekê şerê dewletan li hêlekê jî şerê kurdan û dewletên serdest her li dar bûye. Bayê trajediyê her carê kurd li qeraxeka behrekê dane. Di van salên zor û dijwar da li Herêma Serhedê li bajarokê Dedelîyê stêrkeka geş derketîye û çirûsiye. Beyter (2013:16) di teza xwe ya masterê da sala welidîna Mela Ehmedê Heyderî 1887ê dest nîşan dike. Bajarokê Dedelîyê dikeve navbera Erdîş û Patnosê. Derbarê jîyana Melayî da pir tişt nayêne zanîn, bi taybetî derbarê malbata wî û pêşîyên wî da. Tê zanîn ku navê bavê wî Salih e û ew ji eşîra heyderîyan e. “Şerê cîhanê yê yekem, jiyana Mela Ehmed bi tevahî guherandiye. (...) Mela Ehmed di 28 saliya xwe de beşdariya vî şerî kiriye û wekî encam tê de birîndar bûye. Birayê wî jî di heman şerî de şehîd ketiye. Heçî bavê wî ye, ew hêj berî şerî çûye ber dîlovaniya Xwedê. Dema ku di vî şerî de Rûsan herêma Serhedê dagir kirine, xelkê herêmê ji bêgavî koç kirine. Mela Ehmed jî bi qafileyekê re koçî herêma Nisêbînê kiriye û li Newala Bûnisra bi cih bûye.” (Adak, 2011).

Derbarê salên destpêkê yê perwerdehiya Heyderî da hin xumamî hene lê piştî xwendina ewil tê zanîn ku “Wî li Hîzanê li Medreseya Şêx Şehabeddîn perwerdeya ilmî wergirtiye û piştî demekê ji bo perwerdeyê çûye Tebrîzê.” (Beyter, 2013:21-22). Çûna wî ya Tebrîzê bandor li ser pêşketina wî kirîye, ew li wir hînî farisî bûye û wî berhemên edebîyata farisî ji nêz ve nas kirine. Li gorî ku Adak dest nîşan dike nasnava helbestî ya Heyderî, Ehmed e. (2018).

Heyderî sala 1937ê li Nisêbînê jîyana xwe ji dest daye. Heyderî 50 salan jîyaye û wî çar berhemên giranbiha ji kurdan ra hêlane. “Berhemên wî ev in: 1. Dîwan 2. Eqîdeya Îmanê 3. Munacata Heyderî 4. Teqwîmname. (Beyter, 2013:28). “Mela Ehmed dîwanake gelekî girîng nivîsandiye. Wî jî li pey rêça helbestvanên klasîk di helbestên xwe de edeta bikaranîna mexlesê domandiye. Wî wekî mexles carna Ehmed, carna Heyderî, carna jî Ehmed Heyderî bi hev re bikaraniye. (Adak, 2011). Heyderî di helbestên xwe da zimanekî sade û herikbar bi kar anîye û di zimanê wî da nîşaneyên devoka Serhedê û devoka Mêrdînê belok in. Di helbestên wî da hin peyv û qalibên tirkî, farisî û erebî jî hene.

Dîwana Heyderî dîwaneka tekûz e. Wî di vê dîwana tekûz da cureyên nezmê yên cuda cuda bi kar anîne. Wî di dîwanê da bi nezmên cuda li ser temayên cihê cihê nivîsîne. “Di helbestên Mela Ehmed de temaya xurbet, firqet û hicretê zehf heye. Ev temayên ku aidê jiyana wî ya şexsî ne, bi temaya eşq û muhebbetê ve yên ku malê hemû helbestvanan e, gihiştine hev û helbestvan ketiye nav renc û derdekî mezin de.” (Adak, 2011). Beyter jî di xebata xwe da derbarê mijarên dîwana Heyderî da boçûnên xwe weha eşkera dike. “Herwiha, dema ku meriv bala xwe dide dîwana Heyderî, meriv dibîne ku li seranserê dîwanê temaya ku dertê pêş, hîcret û bêkesî ye. Heyderî hema hema di hemû helbestên xwe de şîkayet ji tenahî û bêkesiyê kiriye. Hetta meriv dikare bêje ku li ser hîcretê adeta termînolojiyek ava kiriye.” (Beyter, 2013:47).

2. Çar Hêman (Agir-Av-Ax-Hewa)

Ji roja ku meraqa awayê çêbûna dinyayê nizilîye dilê mirovan heta vêga mirovan serê xwe bi vê pîrsê ra eşandine ku gelo دنیا ji çi çêbûye û ew li ser çi ava bûye. Pêşîyê li ser bingeha jîyan û dinyayê hizirîne û bi zanîn û şiroveyên xwe bingeha mît û mîtolojiyê danîne. Pişt ra vegêranên mîtolojîk derketine û hatine neqilkirin. Feylesofên Yûnanan jî serê xwe li ser vê meseleyê eşandine û “li gorî wan têgiha arkheyê bingeha hemû heyînan e û hemû heyînan ji wê çêbûne.” (Çağlar, 2008:58).

Yê ku ewil madeyek wekî arkhe destnîşan kirîye feylesof Thales e û li gorî Thalesî arkheya kozmosê av e. Her tişt ji avê çêbûye û dinya jî li ser avê ye. (Şahîn, 2019:9). Dîogones û Anaksîmenes jî ji bo arkheyê hewa dest nîşan kirine. Çağlar ji Arîstoteles neqil dike ku Heraklîtos û Hîppasos jî gotine arkhe agir e. (Çağlar, 2008:62). Empedokles jî li van sê arkheyan ax zêde kirîye. Bi vî awayî feylesofan bersiva pirsê xwe “Madeya bingehîn ya dinyayê çi ye?” dîtine. Ev her çar hêmanên ku feylesofên Yûnanî wekî bingeha hemû heyînan qebûl kirine xwedî cihekî giring û taybet in di jîyana gîyandaran da. Divê bê zanîn ku ev feylesof hemû jî di bin bandora hevdu da mane û ji hev feyz girtine û kêmanîyên feylesofên berîya xwe dagirtine û hin tiştinên din li boçûnên wan yê ser dinyayê zêde kirine. Mesela dema ku arkheya xwe hewa nîşan daye tê da qala agirî jî kirîye. Feylesofê li pey wî Heraklîtos jî wî feyz girtîye û gotîye; Dinya yek e, ne Xwedayekî ew afirandîye ne jî mirovan. Dinya agirekî zindî ye, ne pêşî heye ne jî dawî; û ew li gorî rêgezêkê vêdikeve û li gorî rêgezêkê vêdisê.” (Hançerlîoğlu vgh Çağlar, 2008:66). Platon û Arîsto jî ev çar hêmanên ha wekî arkhe qebûl kirine, lê yê ku li ser bi awayekî rêkûpêk xebitîye Arîsto ye. Çar hêman bûne bingeha fîzîka Arîstoyî.

Kaya (2013:6) di teza xwe ya derbarê mijarê da dibêje ku, “ji van çar hêmanan dudu nêr in dudu jî mê ne. Agir û hewa nêr û lebat in, av û ax jî mê û tebat in.” Yaşın jî ji gotinên Kurnazê sûd werdigire û taybetîyên van çar hêmanan wisa îzah dike, “Agir, ziwa û germ e; hewa, germ û şil e; av, şil û sar e; ax, sar û ziwa ye.” (Kurnaz vgh Yaşın, 2018:7). Hem li civakên rojhilatê hem jî li civakên rojavayê derbarê van çar hêmanan da gelek fikir hatine berpêşkirin û gelek taybetîyên van çar hêmanan hatine analîzkirin û şirovekirin. Çimkî ev çar hêman li ser jîyana mirovan xwedî rol û karîgerîyeka zêde ne, loma jî mirovan giringîyeka zehf dane van hêmanan. Heta li hin cihên dinyayê tê dîtin ku mirov perestî van hêmanan bûne, wan maneyeka afirîner û îlahî bexşî van hêmanan kirine. Loma jî ji felsefeyê bigire heta fîzîk û zanistên civakî, ji dîrokê bigire heta dînê, ji edebîyatê bigire heta mîtolojî û folklorê gelek şop û nîşaneyên van hêmanan li ser van dîsîplinan çêbûye. Ji ber ku dîsîplîna me edebîyat e dê em lê binêrin ka ev hêman di edebîyata klasîk da çawa hatine

emilandin û ev hêman bi çi taybetîyan deretine pêş. Dîwan û berhemên edebîyata klasîk tijî ne bi van çar hêmanan.

3. Bikaranîna Çar Hêmanan Di Dîwana Rûhî û Heyderî Da

3.1. Agir/Ar/Ateş/Nar

Ji çar hêmanên sereke yek jê agir e. Agir di edebiyata kurdî ya klasîk da bi navên cuda hatîye bikaranîn. Hevmaneyên peyvê yên wekî ar, nar û ateşê jî di klasîkên kurdî da hatine emilandin. Agir bi taybetîyên xwe yên reng, şewitandin û biriqînê di edebiyata klasîk da cih digire. Agir evîndaran dişewitîne, dile wan dike wekî kebabê. Dîlber bi evîna xwe agir bera nav û hinavên dildarî dide û wî wekî findekî dişewitîne, loma jî dildar xwe dişibîne findê. Agir di heman demê da sembola dogehê ye jî. Rengdêrên wekî veqetîn, hesret û evînê bi agirî tîrî simbolîzekirin. Rûhî di helbesteka xwe da veqetîna jî yarê dişibîne agirî ango zorbûna vê dûrketîna dişibe şewata agirî. Rûhî dibêje;

Narê hîcra te, li ser min zêde xurbet ah û ah

Çendî zehmetkêş im, ez firqet li min bûye kemal (Aqtepe, 2019:103).

Heyderî jî di helbesta xwe da dûrbûna yarê dişibîne agirî û veqetîna jî yarê bûye sebebe têkçûna xweşîyên dildarî. Heyderî jî vê hêmanê wekî Aqtepeyî bi kar diîne û dibêje;

Yek yek ji min girtin xweşî şohim firaqa ateşî

Da min şeraba bextreşî şubha ezel heq kaseyek (Beyter, 2013:184).

Dîsa Heyderî jî di helbesteka xwe da balê dikişîne ser gurbûna evîna xwe û amaje pê dike ku ji ber kûrbûna hestpêkirina evînê ew bixwe bûye agir, çawa ku agir dema bi tiştêkî digire jî jêr heta jor dişewitîne evin jî dildarî dişewitîne.

Ez jî te'sîratê 'işqa te seraser agir im

Va bi dest û pa ketim berda bêlû'lû'suxenan (Beyter, 2013:201).

Dîlber di edebiyata klasik da tim û tim li gorî asta xwe di ser dildarî ra ne. Ew lebat dildar jî tebat in. Ew tebîb in, dildar nexweş û bêhal in. Li malika jêrîn jî Heyderî dîlbera xwe dike keseka agirwerker. Dîlber bi çavên xwe yên şehlayî agirî bi ser dildarî da dibarîne. Ango awirên dîlberê wekî agirî hatine hesabandin.

Li Ehmed agirek werkir rewanê Heyderî zerkir

Cunûn û dîn û ebter kir bi çeşmanê xwe'ê şehla (Beyter, 2013:221).

Aqtepî jî di beyteka xwe da bi heman awayî bale dikişîne ser awir û nêrîna yarê û ji ber tesîra evîna yarê dile xwe dişibîne kura agirî. Dîlbera wî ya çavxezal dema lê dinêre dildar ji ber wê nêrînî dibe kura agirî, tim û tim dişewite. Çawa ku kûra agirî bi şewateyan daîm dişewite, yek nezereka dîlberê bes e ku dil li dildarî bibe kura agirî. Aqtepî dibêje;

Qalê bûm bégaz û çakûç û nefax û kûre-nar

Yek nezer weqtê ku da min şengê şoxa çavxezal (Aqtepî, 2019:105).

Çawa ku agir di maneya rasteqînî da hatîye bikaranîn her wisa di helbesta klasik da agir bi maneya mecazî jî hatîye bikaranîn. Heyderî di malikeka xwe da gotinên yara xwe wekî agirekî sotîner bi nav dike û dibêje;

Ji afaqan li min tîr û teber barîn

Ditirsim ruh telef kim ez di vê herbê

Ji rengê ateşê sûzan xeber barîn (Beyter, 2013:163).

Aqtepî jî di malikeka xwe da şeraba xwe û bandora wê bi maneya mecazî li agirî banandîye û şeraba ku yarê daye wî, bi peyva ateşê kirîye ravek û bandora şerabê bi vî awayî rave kirîye. Aqtepî dibêje;

Min ji destê dîlberê, noşî şerabê ateşî

Pêl bi pêl hîlbû ji te'sîr-eş li dil narê xiram (Aqtepî, 2019:109).

Di helbestên her du helbestvanan da xaleka din ya hevpar jî ew e ku ji ber biriqîn û şewqa agirî ew bi maneya şewq û nûra li Çîyayê Tûrê hatîye bikaranîn. Bi rêya Tûrê Sînayê hunera telmîhê tê çêkirin. Aktepî dibêje;

Tecella eqsedê Tûr î, perî-peyker, sîfethorî
Bi saxî xistime kûrê; dibim atêş bi nefxê ra (Aqtepî, 2019:38).

Xal ‘ebîr û şadenûra dilpezîr
Bêqusûr e wird û cûra tevherîr
Mah û xûrşîd in di ruxsarê munîr
Nar û nûrê Tûrê Sîna’ê Xuda (Beyter, 2013:84).

3.2. Av/Ab

Av vexureka sereke ya hemû zindîyan e, roleka wê ya sereke li ser jîyana mirovan heye. Ji berê da ye mirovan her xwe li cihên avî girtîye, war û wargehên xwe li ber avan danîne. Ji ber vê jî hem di mîtolojîyê da hem jî di nava edebîyata gelêrî da mirov rastî gelek motifên avê û derbarê avê da tê. Di helbesta klasik da gelek caran peyva ‘av’ê bi serê xwe hatîye bikaranîn. Gelek caran jî peyvên kanî, çem, gol, rûbar û behrê nîşaneyên hêmana avê ne. Av; paqijî, zelalî û helalîye destnîşan dike. Pala (2020:1) derbarê hêmana avê da dibêje ku; “Taybetîya wê ya sereke ew e ku ew jîyanê bexşî mirovan dike....Av hem xetere ye hem jî nametek e, bi taybetîyên xwe yên xeniqîn û xerabkirinê nîşaneya talûkeyê ye; bi taybetîyên xwe yên paqijkirin, pêşvebirin û xweşikirinê jî nîşaneya nametê ye.” Di vê helbestê da Aqtepî zelalîya avê derxistîye pêş û ava zelal ya serkanîyê li gel safitîya ehlên Xwedayî bi kar anîye. Ango ew wekî nametekê nîşan daye.

Sefwetê ehlê Xuda, serçeşmeê abê zual
Şahê ewrengê Buxara, haîzê genca kemal
Xeyrê dergahê te, tewbe min nîye, fikr û xîyal
Şukrû’l-lîllah bende me, dest-beste der-seffê nîal
El-eman, şahê mezin! Yexsîrê zencîra te me (Aqtepî, 2019:145).

Heyderî jî di helbesta xwe da talûkeya avê derdixe pêş û xerqbûna di avê da wekî nîşaneyeka neyînî destnîşan dike.

Şem’a te Eşmed Heyderî hilbû di fanûsa zûcac
Qeşra te pir kir enwerî ferxendebad nî’me`s-sirac
Durra te dil lê muşterî xûrşîd ji şewqê bû wehac
Lefzê ‘ebîr û ‘enberî cerhê te dîtî jê ‘îlac
Gerq im di ava kewserê rast û şîmal kafûr im ez (Beyter, 2013:133).

Di her du helbestvanan da xaleka din ya derdikeve pêş ava heyatê ye. Ava heyatê ew av e ku li gorî bawerîya bawermendan heçî ji wê avê vexwe nemir dibe û êdî namire. Heyderî di malikeka xwe da her du lêvên yara xwe wekî ava heyatê bi nav dike û wisa lê dihere;

Mehcubhet e gëbgëb ji zîv abi`l-heyat in herdu lêv
Şehd û nebat in her di nêv neyşeker e ew şeng û şox (Beyter, 2013:112).

Aqtepî jî di helbesteka xwe da dîlbera xwe dişibîne ava heyatê û nefesa Hz. Îsayî. Lê vê bi zimanê aşîqî nabêje bi zimanê maşûqî dide gotin.

Bo te qafî kim, kelamê; guh bide beyta fesîh
Zanim ez naête destê min, ‘aşîqê çendîn melîh
Abê heywan im, bixwe hem nefsê enfas ê Mesîh
Dê li te pîrî bedel kim, hey bikim ‘ezmê remîm (Aqtepî, 2019:119).

Xaleka din ya hevpar ya her du dîwanan ew e ku helbestvan eşqê dişibînin behrê û aşîq di wê deryayê da yan li ber pêlan diçin tînan jî di wê eşqê da dixeniqin. Aqtepî dibêje;

Xerîqê qulzumê ‘îşq im, reîsê ekremê ‘îşq im
Bide Cam-ê Cem ‘eşq im, qewî me ez di de’waê (Aqtepî, 2019:160).

Heyderî jî eşqa xwe dişibîne deryayeka pêldar ku ew eşq û evîn zorê dide dildarî û aşîq li ber pêlan diçe û tê.

Derya’ê ‘îşqê hate xoş dîsa ji nû bû mewc û kef
‘Aşîq ji nageh bir ji hûş durdaneya fîncan şedef (Beyter, 2013:172).

Ji bikaranînên edebîyata klasîk yek jî behreya rehmê yan jî deryaya rehmetê ye. Helbestvan Xwedê, pêxemberê/ên Xwedê, ewlîya û enbîyayan, dîlbera xwe bi vê rengdêrê terîf dike. Aqtepî di malikeka xwe da dibêje ku;

Şahê min, Mewlayê min, axayê min, pîrê terîq!
Geştîbanê qulzum û ‘emmanê rehm î, ez xerîq (Aqtepî, 2019:160).

Heyderî jî balê dikişine ser heman bikaranînê û daxwaza merhemed û dilopek rehmetê dike ji xwedîyê rehmetê.

Li dilda vê gedarê nişterek narîn

Tu Ğeyyas î riha ke min ji vê kerbê

Tu Feyyaz î te cûd û merhemed karîn

Ji behra rehmtê qîçrek li min werbê (Beyter, 2013:163).

Derbarê hemanê avê da li gel ewçend hevparîyan xaleka balkêş ya cuda jî heye, Aqtepî di Dîwana xwe da li du cihan bi mebesta şerabê qalibên wekî “abê yaqûtî” (2019:113). û “abê engûrî” (2019:151) bi kar anîne. Berovajîyê vê yekê di Dîwana Heyderî da em rastî bikaranîneka wiha nehatin. Her du bikaranînên Aqtepeyî bi vî awayî ne;

Bo dilê sedmet-zede, carek veke babê ‘eta!

Abê yaqûtî bide weqtê seher, ser sîmê cam (Aqtepî, 2019:113).

Bi naz û dilrobayî, bête bezmê ‘aşiqan dîlber

Muresse’ tacê zer, ber ferqê nazik ez dur û gewher

Hemî, medhûşî bin, kef ber dîhen bê ‘eql û hiş yekser

Bi cunbuş, têkde bin ez şewqê yar û abê engûrî (Aqtepî, 2019:151).

3.3. Ax/Xak/Tûrab

Ax, di edebîyata klasîk da bi navên cihêreng û maneyên cuda cuda hatîye bikaranîn. Dema mirov li berhemên klasîk dinêre dibîne ku ax bi navên xak û tûrabê jî hatine bikaranîn. Navên di yên eleqedarê wê jî erd û herî ne. Xaleka din ya bikaranîna di edebîyatê da mirin e ku mirov ji axê tîne û vedigerin axê. Xaleka hevpar ya her du Dîwanan e ku her du helbestvanan sûd ji dinê îslamê girtine, qalibekî di Quranê da bi heman awayî bi kar anîne. Aqtepî dibêje;

Min ji narê bû’ d û dîr î, cerg û dil tîk bû kebab

Şefqe ke ber min feqîrê bêkes ê can der-‘ezab

Derdê min subh û mesa “*Ya leytenî kuntu turab*” (Aqtepî, 2019:88).

Heyderî jî di helbesta xwe da heman gotina Quranê bi kar anîye û daxwaza xelasîya derdan dike.

Serxoş kirim bê 'eqî û tab hiştîm di nav zecr û 'etab
Yaleytenî kuntu turab wellah bi van derdan reş im (Beyter,
 2013:196).

Xaleka din ya hevpar di her du dîwanan da ev e ku
 helbestvan ji ber hezkirina xwe ya dîlberê dixwazin nêzîkî yarê
 bibin. Lê dîlber ti car vê derfetê nade wan loma ew jî dixwazin ku
 bibin axa bin pêyên yarê. Pêyên wê pê li wan bikin û ew jî wê
 kêlîyê lingên yarê ramûsin. Helbestvan dixwazin ku canê xwe
 fidayê yarê bikin. Heyderî di malikekê da dibêje;

Canê şêrînim fîda'ê xakê ber payê te bit
 Qalibê bêruh bibit pejmurde'ê kûh û betah (Beyter,
 2013:110).

Aqtepi pîrozîya azê zêdetir dike, axê dike dewsa zîndeyekê
 û bi wê ra dipeyve û rojbaşan dide axa bin linge yarê. Çimkî yara
 wî ya Îsewîteb bi evîna xwe mirîyan zindî dike mîna Hz. Îsayî.

Sed sebah"ul-xeyrê min, xakîpayê dîlberê
 Îsewî teb'ê! Kubarê! Nazîkê! Dêm-enwerê! (Aqtepi,
 2019:87).

Li gorî bawerîya herî belav ya rojhilatê misilmanîyî
 Xwedayî mirov ji herîyê çêkirîye û îcar herî jî ji ax û avê çêdibe.
 Di edebîyata klasîk da gelek caran bi rêya telmîhê ev hêman
 hatiye bikaranîn. Dema ku mirov bala xwe dide her du Dîwanan
 tê dîtî ku Heyderî bi rêya telmîhê bûyera afirandina însanî
 derxistîye pêş, lê di Dîwana Aqtepi da tiştekî wisa me nedît.
 Heyderî dibêje;

Ey şehînsahê du 'alem bû di ramê Xatemê
 Şed Suleyman û Sîkenderha di emr û xîdmetê
 Xakê eqdamê mubarek nûrê çeşmê èalemê
 Ne şedef hindî mekan gerq in di şewqa cubhetê
 Dawerê kewn û mekangîrê di berya Ademê
 Gulcebînê tensîmînê lebşêrînê şehde lê (Beyter, 2013:227).

3.4. Hewa

Hewa di berhemên klasîk da wekî hêmaneka bingeîn ya
 enasîrê erbayê bi awayên cuda hatiye bikaranîn. Hewa yan ruh û
 nefes e, yan ba ye. Bi serê xwe wekî hewayê ku îro jê tê famkirin

pir nehatîye qalkirin. Piranî jî ba ye ku ew bixwe xeberguhêzê navbera dildar û dilberê ye. Bayê herî zêde qala wî hatîye kirin, bayê nesîm e. Bayê nesîm bayê serê sibehê ye, ango sira sibehê ye. Ev ba, bayekî nerm e û piranî demsala biharê tê. Loma jî piranî bi alîyên xwe yên erênî hatîye bikaranîn. Di her du dîwanan da jî em rast lê tên ku helbestvanên van her du berheman jî wekî yên berîya xwe ev qalib bi kar anîne. Heyderî jî di dîwana xwe da ev peyv li gel peyvên bêhn, sibeh, bihar û aşîqî bi kar anîne.

Me berda canîbê qiblê seher badê nesîm lê da

Dema bêhna hebîbê nûbiharek da dilê ‘aşîq (Beyter, 2013:180).

Aqtepî jî wekî Heyderî di helbesteka xwe da qala bayê serê sibehê dike û wî bayî wekî bayê nesîm bi nav dike. Wî jî ew peyv bi peyvên seher û aşîqê ra emilandîye.

Hem selamê canfîzayê Padişahê Qudretê

Pertewa wechê me lê bit, dem be dem her sa’etê

Zulfê şeb-reng im, şemîma muşkê Tetarî de tê

Bit li canê ‘aşîqê min, her sehergeh ba nesîm (Aqtepî, 2019:114).

Xaleka din ya hevpar jî ew e ku her du helbestvanan jî peyva nefesê bi heman awayî û bi heman maneyê bi kar anîne.

Her bi sextê tên diborin dem û dewranê di min

Yek nefes bêgem nedîdem hem nebû carek wişal (Beyter, 2013:180).

Sed hezar sewgendê min, ew tarê zulfê xem bi xem

Hem bi an tacê Qubadê kec, wekî Şahê ‘Ecem

Nabitin dil, yek nefes xalî, ji seffê derd û xem

Bes ke tedwîlê fîraqê, can me ket’ye ber elem

El-eman! Sed el-eman! Şox û şengê pur delal! (Aqtepî, 2019:87).

Xaleka cuda ya her du dîwanan jî ew e ku Heyderî peyva nefesê li gel peyva Hz Îsa bi kar anîye û taybetmendîya vejandina zindîyan li hezkirîya xwe bar kirîye. Berovajîyê vê em di berhema Aqtepî da rastî bikaranîneka wiha nayên. Heyderî dibêje;

‘Eksek ji husnê bû ‘eyan pertew giha kewn û mekan
 ‘Îsanefes şêrînzêban mêşên li pey şehdê lebeş (Beyter, 2013:146).

4. Encam

Daxwaza famkirina çêbûna dinyayê diçe heta serdemên kevn. Mirov nîşaneyên van daxwaz û meraqan di mîtolojî, edebîyata gelêrî û folklorê da bi rihetî dibîne. Piştî serdemên dûr û dirêj ev daxwaza famkirinê hinekî din sistematîk bûye û li Yûnana Antîk feylesofan serê xwe bi arkheyê ra êşandine ku li gorî wan ew cewhera dinyayê ye. Her çend rayên cuda hebin jî piştî demekê hizreka giştî derdikeve ku dinya ji çar tiştan hatîye pê: agir, av, ax û hewa. Ev çar hêmanên bingeîn bûne mijara gelek dîsîplînan. Wekî dîsîplînen din yên zanistê, edebîyatê jî hem ji van çar hêmanan sûd wergirtîye hem jî reng daye wan. Di vê gotara xwe da me dil kir ku em bikevin pey şopa du helbestvanên kurd yên klasîk û di navbera Dîwanên wan da berawirdîyekê bikin ji alîyê hêmanên bingeîn ve.

Di xebata xwe da me dît ku hem Heyderî hem jî Aqtepî bi gelek awayan sûd ji van çar hêmanan girtine. Pîranî wan jî dane pey şopa helbestvanên berîya xwe û mazmûn û qalibên berîya xwe bi kar anîne. Li gel van xalên hevpar li cihnan jî em rast lê hatin ku di navbera her du helbestvanan da hin bikaranînen cuda hene.

ÇAVKANÎ

Adak, A. (2011). Helbestvanê Muhbet û Xurbetê: Mela Ehmedê Heyderî. *Nûbihar*. c.15. h. 116. Stenbol.

----- (2017). Rûhî: Helbestvanekî Dahêner ê Serdema Piştî Mîrektiyan û Bandora Wî. *Sûryani Arap ve Kürt Klasikleri Uluslararası Klasikler Çahştayı Bildirileri, Mardin 2017. İçinde* (491-511).

----- (2018). Mexles di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de. *Nûbihar Akademî*. Sal. 5. h. 10. di navê da (11-58). Stenbol.

Aqtepî, E. Ş. (2019). *Dîwan*. (amd. M. E. Hêvîdar). Stenbol: Weşanên Dara.

Aslanoğlu, O. (2019a). Şeyh Abdurrahman-ı Aktepi'nin Divanındaki Konular. B. Karaca&E. İslamoğlu&E. Kirik (Ed.). 4. *Uluslararası Bilimsel Araştırmalar Kongresi (14 – 17 Şubat 2019/Yalova). İçinde* (657-670). Ankara.

----- (2019b). Abdurrahman Aktepi'nin Divanında Geçen Şahsiyetler. *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*. Cilt: 12 Sayı: 64 Haziran 2019. r. 15-34.

----- (2020). Gîya di Dîwana Şêx Ebdurrahman Aqtepî da. *The Journal of Mesopotamian Studies*. C: 5/1. Winter 2020. r. 22-46

Çağlar, B. (2008). Türk Mitolojisinde Dört Unsur ve Simgeleri Üzerine Bir İnceleme. Teza Lîsansa Bilind ya Çapnebûyî. Kocaelî: Kocaeli Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Ertekîn, Z. M. (2019). Recmiyye/Le'Netname Wek Cureyek Nezmê û Le'Netnameya Şêx 'Ebdurrehmanê Aqtepî (Lêkolîn-Ferheng). *e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi/Nisan-2019*. Cilt:11 Sayı:1 (23) r.36-51.

Kaya, N. (2013). *Ahmet Hamdi Tanpınar'ın Eserlerinde Dört Unsur Ateş-Hava-Su-Toprak*. Teza Lîsansa Bilind ya Çapnebûyî. Enqere: Gazi Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Özaydın, M. (2008). *Şeyh Abdurrahman Aktepe Hayatı Eserleri ve Tasavvufî Görüşleri*. Teza Doktorayê ya Çapnebûyî. Enqere: Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Pala, Î. (2020). *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*. 31. Basım. İstanbul: Kapı Yayınları.

Şahîn, M. N. (2019). *İbn Sînâ'nın Doğa Felsefesinde Dört Unsur*. Teza Lîsansa Bilind ya Çapnebûyî. Stenbol: İstanbul Medeniyet Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Yaşın, B. (2018). Yunus Emre Divanında Anasır-ı Erbaa. Teza Lîsansa Bilind ya Çapnebûyî. Elezîz: Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Yildiz, Z. (2020). *Lêkolînek Li Ser Dîwana Şêx Ebdurrehmanê Aqtepî (Rûhî)*. Teza Lîsansa Bilind ya Çapnebûyî. Bîngol: Zanîngeha Bîngolê Enstîtuya Zimanên Zindî.

Nêrîneke Giştî Li Ser Kurteçîroka Bindarûkê*
 Bindarûk Kîsa Hikâyesi Üzerine Genel Bir Bakış
 A General Overview of the Short Story Bindarûk

Zeynep Sultan ATLI**
 Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU***

Pûxte

Çîrok cureyek ji nivîsandina berhemên pexşanî û edebî ye. Piştî serdema modern bi pêşxistina pedagojiyê va ji bo zarokan pêdiviya çîrokan zêde bûye. Di her neteweyekî da cihê xwe parastîye, li ser kiras û dêsmana wê neteweyê hatiye sazîkirin. Bi gelemperî çîrokên kurdan jî helbet li ser van babetan avabûne. Ji hêla fonksiyonên wek piştîgirêdan, destnîşankirin, ragihandin û xurtîkirina nîrxan da, jî hêla edet, tore û avakirina civatan va ji her çîrokên neteweyên din xweser û cuda ne.

Çîrokên kurdî jî bi salan xwe sipartine van dêsmanan û bi dirêjahiya salan çîrok afirandine. Li gorî demê dibe ku kirasê xwe guherandibin lê fonksiyona xwe ya sereke pêk anîne. Çawa ku nabe mirov nivîskarekî/ê bêcivat û civatekî jî bê nivîskar bifikire her nivîskarî jî jiyan an jî rewşên civatê ji xwe ra wek babet bikaranîne û carinan jî di bin bandora wê da mane û li ser wê dêsmanê xwe avakirine. Çavdêrî di nav gel da kirine û gelek caran ev çavdêrî bi teknîkên diyalogan raxistine ber çavên me.

Piştî demekê çîrok jî di nav xwe da bi beşan jî hev cuda bûye. Wek Birûske Çîrok, Çîrok Mam Navendî, Kurteçîrok, Novlet hatiye dabeşîkirin. Di vê nivîsê da jî em ê di sazîkirina kurteçîrokê da girîngiya mekan, fonksiyona diyalogan û bikaranîna vegêranê da

* Kurteya vê gotarê di sempozyûma bi navê “Dicle Üniversitesi Lisansüstü Öğrenci Sempozyumu 4-5 Kasım 2025”ê de hatiye pêşkêşîkirin. Çap nebûye.

** Zanîngeha Dicleyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Şaxa Makezanista Ziman û Edebîyata Kurdî, Xwendekara Lisansa Bilind a Ziman û Wêjeya Kurdî zeynepsultano4@gmail.com

*** Doç. Dr., Dicle Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Doğu Dilleri ve Edebiyatları Bölümü Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı, aslanogluosman@gmail.com

berê xwe bidin kurteçîroka Mem Zînistanî ya bi navê *Bindarûk* ê.

Peyvên Sereke: Çîrok, Kurteçîrok, Mem Zînistanî, Bindarûk.

Özet

Hikaye, yazılı edebi ve nesir türülerinden biridir. Modern dönemden sonra pedagojideki gelişmeler çocuklar için hikaye yazarlığını elzem kılmıştır. Hikaye her alanda yerini korumuş, ait olduğu ulusun özellikleri üzerine kurulmuştur. Genel çerçevede Kürt edebiyatında da bu unsurlar üzerine oluşmuştur. Fonksiyonel olarak yaslanma, belirleme, iletim vedeğerlerin güçlendirilmesinde, gelenek görenek yönünden ve toplum inşasında diğer ulusların hikayelerinden elbette farklılıklar içermektedir.

Kürtçe hikayecilik de bu unsurları dayanak almış ve yıllarca hikayeler üretmiştir. Zamansal farklılıklardan ötürü yer yer farklılıklar göstermiş olsa datemel fonksiyon/işlevini gerçekleştirmiştir. Bir yazarı toplumdan kopuk düşünemediğimiz gibi toplumuda yazardan kopuk sayamamakla beraber her yazar toplumun yaşamını, toplumsal olayları zemin olarak kullanmış hatta bazen bunların etkisi altında da kalarak bu etkenler üzerine inşasını gerçekleştirmiştir. Toplumda gözlem yapmış ve çoğu zaman bu gözlemleri diyalog tekniği ile gözleer önüne sermiştir.

Hikaye, bir süre sonra kendi içinde bölümlere ayrılmıştır. Öreneğin Gotik Hikayeler, Olay Hikayesi, Kısa Öyküler, Novlet olarak birbirinden ayrılmıştır. Bu yazıda biz de hikaye anlatıcılığında mekanın önemi, diyalogların fonksiyonlarından ve anlatıcı dilin kullanımı kapsamında Mem Zînistanî'nin Bindarûk isimli kısa hikayesini değerlendireceğiz.

Anahtar Kelimeler: Hikaye, Kısa Hikayeler, Mem Zînistanî, Bindarûk.

Abstract

Story is one of the genres of written literature and prose. After moder period, the tendency to write stories for children has diminished in pedagogical developments. Story has secured its place in even field built on the unique characteristic of the nation it belongs to. In general perspective, also in Kurdish literature is has been built on these elements. Functionally, there are differences in aspects such as aging,

determination, strengthening of communication values, traditional direction, and the construction of society compared to stories of other nations.

Kurdish storytelling has been based on these elements and has produced stories for many years. Despite displaying variations from time to time, it has consistently fulfilled its core function. A writer cannot be regarded as detached from the society they emerge from; every writer draws upon societal life and events as their primary source, and is sometimes even influenced by these social dynamics in constructing their narratives. Writers have conducted societal observations and, in most cases, brought these observations to the forefront through the use of dialogue techniques.

After a while, the genre of the story has diversified into various subgenres. Examples include Gothic stories, event-based stories, short stories, and novels, each distinguishing itself from the others. In this study, we will also examine Mem Zînistanî's short story called Bindarûk with regard to the significance of setting in storytelling, the functions of dialogue, and the scope of narrative language usage.

Key Words: Story, Short Stories, Mem Zînistanî, Bindarûk.

DESTPÊK

Teknîka modern a çapkirinê di sala 1440î de li Almanyayê, li bajarê Mainzê ji aliyê Johann Gutenberg ve tê îcadkirin. Nimûneyên kitêbên ku di salên 1454-1455an de li Mainzê, bi tîpên madenî hatine çapkirin îro li ber destan in.¹⁹ Piştî teknîkên çapkirinê ên modern berhemên wêjeyî jî cihê di nav rûpelan da girtine. Di warê wêjeyê de ; roman, çîrok, helbest, rojname û h.w.d nivîsan cihê xwe mîsoger kiriye. Di nav kanona cîhanî de helbet kurdî jî bi zarave û nivîskarên xwe bi adan û berhemdar bûye. Her nivîskarî reng û dirûvên fikr, raman, herêm, civat û devoka xwe bi rêbaz û şewazên cuda daye der.

Mem Zînistanî jî nivîskarek ji wan nivîskarên kurteçîrokan e. Zînistanî kurteçîrokên xwe, bi çavdêriya gelê

¹⁹ Serfîraz, Mesûd, *Kurd, Kitêb, Çapxane*, Stenbol, Weşanên Peywend, 2015, r.9

Serhedê, taybetî jî li ser devoka Bazîdê honandiye. Di warê vê cureyê da deng û rengê nû û xwedî qelemeke bihêz e. Berhema wî ya yekem bi navê *Bindarûk* di sala 2015'an û ya duyem jî bi navê *Heşterxan* 2018'an da hatiye çapkirin.

Em anegorî naveroka çîrokê dikarin di bin serenavên çîrokên rewşî û çîrokên bûyerê biseniffnin, bi vî awayî jî pênasekirina wê hêsan dibe. Sînorê çîrokê yê ku E.A. Poe'yê diyar kiriye, çîroka bûyerî ye. Çîroka bûyerî da honak, li ser destpêk-girêk-çareserî dabeş dibe. Çîrokên Maupasant jî çîrokên bi vî qaydeyî ne. Lê çîrokên rewşî bi vê honakê va girêdayî nînin, carînan destpêk-girêk, carînan girêk-çareserî, carînan jî tenê girêk heye. Lewra çîrokên rewşî pîrsgirêkê çareser nake, nîşan dide û zêdetirî jî çîrokên rewşî bi Çehov tînin nasîn.²⁰

Dema ku em li gorî van qaîdeyan kurteçîrokê dinirxînin em dibînin ku zêdetirî hêman û qaîdeyên wê di bin çetra çîroka rewşî da ne. Rewşa têdeyî hatiye nîşandan û tu hewleke çareserkirinê nayê dîtin. Nivîskar 'eynikekî li leheng û rewşa wan digire, tiştê heyî bi şayesandinan nîşanê me dide. Em dikarin vê yekê bispêrine gelek mînakên û yek ji wan:

Ahmedzade, H. (2004). *Ulus ve Roman*, (Çev. Azad Zana G.). Pêrî Yayınları.

Ahmedzade, H. (2010). *Di Romana Kurdî de Guherînên Şêweyî û Babetî*. Hakkari Üniversitesi Yayınları.

Ahmedzade, (2011). *Romana Kurdî û Nasname*. Avesta Yayınları.

Akboğa, H (2013): “*Radyoya Êrîvanê*”, Kürt Tarihi Dergisi, (s. 4, Aralık 2012- Ocak 2013)

Alakom, (R). *Kars Kürtleri*, Avesta Yayınları.

Alan, (1997) *Kürt Halk Şarkıları İçin Küçük Bir Poetika*, (War Dergisi, s. 2, Sonbahar)

Alan, (2009). *Bendname*. Avesta Yayınları..

Allison, C. ve Kreyenbroek, P (2008). *Kürt Kimliği ve Kültürü*, (Çev. Ümit A.). Avesta Yayınları.

Aydoğan, İ. S. ve Ergul, S.T. (2011.). *Hakkari Üniversitesi Kürt Dili ve Edebiyatı Konferansı Makaleleri*. Hakkari Üniversitesi Yayınları Hakkari.

Aydoğan, İ. S. (2012). *Hin Nirxandin û Îstatîstîkên li ser Romana Kurdî*.

http://www.amidakurd.net/nuce/75_sal_%C3%BB_197_roman%C3%AAn_kurd%C3%AE_kurmanc%C3%AE (Erişim tarihi: 20 Mart 2012.)

Boyık, E. (2007) “*Hîmdarê Edebiyata Kurdî yê Ewîlîn Nivîskarê Eyan Bavê Romana Kurdî*”, W Dergisi, (s. 15, Temmuz- Ağustos).

Baqir, (2007) “*Ji Şivantiyê Ber bi Zanyariyê ve*”, W Dergisi, (s. 15, Temmuz- Ağustos).

Boyük, E. (2011). “*Nihêrîna li Ser Edebiyata Kurdên Sovyetê.*” *Hakkari Üniversitesi Kürt Dili ve Edebiyatı Konferansı Makaleleri*. Hakkari Üniversitesi Yayınları Hakkari.

Celîl, C. (2005): “*Radyoya Kurdî li Yerîvanê û Bingehtanîna Wê*”, *Bîr Dergisi*, (s. 3, Sonbahar).

Cewerî, F. (2006). *Hawar*, c. I- II, Nudem Yayınları.

Çaçan, X. (2007). “*Miletek di Heyra Wî de Bû*”, *W Dergisi*, (s. 15, Temmuz- Ağustos).

Deniz, S. (2007). “*Her Ew Hesret û Ew Xwezî*”, *W Dergisi*, (s. 15, Temmuz- Ağustos).

Derwêş, H. (2010). “*Ber bi Romana Kurdî ve*”, *W Dergisi*, (s. 31).

Dewran, Ö. (2010). : “*Roman*”, *W Dergisi*, (s. 30., Ekim- Kasım).

Dildar, R. (2005). “*Heupeyvîna bi Tosinê Reşîd re: Li Welatekî Azad Rûmeta Merîv Heye*”, *Bîr Dergisi*, (s. 2, Yaz).

Ergül, S. T. (2007). *Kürt Şiiri Antolojisi*, c. I, II, Agora Yayınları.

Ergün, Z. (2009). “*Heupeyvîn bi Dr. Efrasyab Hewramî be: Sovyetê Kurd li Ser Axa Xwe Nehîştin*”, *Nûbihar Dergisi*, (s. 107, Bahar).

Eroglu, Y. (2010) “*Muzexaneyaya Kulan û Vegotina Banî*”, *W Dergisi*, (s. 31, Mart- Nisan)

Evdal, E. ve Cindî, H. (20089. *Folkloru Kurmanca*, Avesta Yayınları.

Galip, Ö. ve Abidin, P. (2010). *Kürt Romanı*, Sel Yayınları.

Hassanpour, A. (2004). “*Stalîn, Qeyrana Şoreşê û Rûxîna Komara Azerbaycan û Kurdistanê*”, *W Dergisi*, (s. 15., Temmuz- Ağustos).

Hesen, Ş. (2008). *Payîz û Ba*, Avesta Yayınları.

Jameson, Fredrich: F. (2005). *Modernizm İdeolojisi*, (Çev. Kemal A. ve Tuncay B., Metis Yayınları.

Jusdanis, G. (1998). *Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür*, (Çev. Tuncay B.) Metis Yayınları.

Konak, İ. (2013). “*Sovyet Kürtlerinin 1937- 38 Sürgünü*”, Kürt Tarihi Dergisi, (s. 4, Aralık 2012- Ocak 2013).

Kutlay, N. (1998): “*Romana Kurdî*”, W Dergisi, (s. 5-6., Yaz-Sonbahar).

Kutlay, N. (2001). “*Kafkas Halkları- Kürt Edebi İlişkisi*”, War Dergisi , (s. 10- 11, Sonbahar- Kış).

Loran, E. (2010). “*Bi Romanûsan Re Guftûgo Loqman Polat, Lokman Ayebe, Menaf Osman, Omer Dilsoz, Şener Ozmen*”, W Dergisi, (s. 30, Ekim- Kasım).

Loran, E. (2010). “*Hevpeyvîn Bi Helîm Yûsiv Re*”, W Dergisi, (s. 30, Ekim- Kasım).

Meretowar, A. (2007). “*Kesayetiya Edebî ya Ereb Şemo*”, W Dergisi, (s. 15, Temmuz- Ağustos).

Moran, B. (2007). *Türk Romanına Eleştirel Bir Bakış*, 16. b., İletişim Yayınları.

Moran, B. (2009). *Edebiyat Kuramları ve Eleştiri*, 19. b., İletişim Yayınları.

Nazê, B. (2007) “*Hevpeyvîna bi Erebê Şemo re ya Berî 25 Salan*”, W Dergisi, (s. 15, Temmuz- Ağustos).

Nikitine, B. (2010). *Kürtler*. 2. b., (Çev. Karahan, E., Akkuş, H., Uğurlu, N.,) Örgün Yayınları.

Parla, J. (2010). *Don Kışot'tan Bugüne Roman*, İletişim Yayınları.

Polat, E. (2007). “*Ji Aliyê Teknîka Romanê Ve Dımdım û Erebe Şemo*”, W Dergisi, (s. 15, Temmuz- Ağustos).

Resûl, Î. (2010). *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî*, Aras Yayınları.

Reşan, N. G. (2008). *Navdarên Kurd*, Doz Yayınları.

Reşîd, T. (2010). “*Kurdên Yekîtiya Sovyetê: Berê û Niha*”, Bîr Dergisi, (s. 12, Kış).

Roj, C. (2007). “*Pirên Şikestî û Îzolasyona Gewr*”, W Dergisi, (s. 15, Temmuz- Ağustos).

Sagıç, F. H. (2002). *Dîroka Wêjeya Kurdî*, İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları.

Şemo, E. (2007). *Dımdım*, Lîs Yayınları.

Şemo, E. (2007). *Hopo*, Lîs Yayınları.

Şemo, E. (2007). *Jiyana Bextewar*, 2. b., Deng Yayınları.

Şemo, E. (2007). *Şivanê Kurmanca*, Lîs Yayınları.

Şirin E. ve Azad, Z. (2007). “*Dosya- Erebe Şemo*”, W Dergisi, (s. 15, Temmuz- Ağustos).

Taels, H. (2001). *Eski Sovyetler Birliği'nde Kürtler*, (Çev. Nadire, I.,) Pêrî Yayınları.

Xelîl, T. (2007). “*Erebê Şemo Rûspitiya Gelê Kurd*”, W Dergisi, (s. 15, Temmuz- Ağustos).

Yılmaz, M. (1998). “*Serbilindî û Serkeftina Romana Kurdî*”, W Dergisi, (s. 5-6, Yaz).

Yûsiv, H. (2010). “*Nîfşê Bêjî, Qeyikên Romana Kurmancî di Nav Pêlên Siyasetê de*”, W Dergisi, (s. 31, Mart- Nisan).

Yûsiv, H. (2011). *Romana Kurdî*, Ronahî Yayınları.

Zinar, Z. A. (2007). “*Nivîskarê Kurd, Kedkar û Sûxrevanê Wêjeya Kurdî Erebê Şemo*”, W Dergisi, (s. 15, Temmuz- Ağustos).

Di Pêwendîya Sazkirina Nasnameyê Da Erka Ziman*

Kimlik İnşası Bağlamında Dilin İşlevi

The Function Of Language In The Context Of Identity
Construction

Mehmet Salih SÖNER**

Tahirhan AYDIN***

Kurte

Em di vê xebatê da li ser pêvajoya dîrokî ya ziman rawestîyan û me şiroveyên cuda yên gelek vekoleran pêşkêş kirin. Em li ser pirsên wekî 'Gelo ziman ji zayînê ve tê yan mirov ziman paşê diafirînin? Pêkhatina zimanan bi destê mirovan bûye yan jixweber hebûye?' sekinîn û me di derbarê nêrînên li ser afirandîna û pêvajoya dîrokî ya zimanan da bersiv pêşkêş kirin. Ji aliyekî din ve, me destnîşan kirîye ka desthilatdarî wekî kirdeyeke navendî çawa cih dide ziman; herweha di avakirina çand û nasnameyê da, di sazkirina netewe-dewletan û hilberandina çandeka nû da rola sereke ya ziman çawa tê girtin û wekî amûreka bikêr, tê bikaranîn. Di heman demê da, me di avakirina nasnameyê da taybetmendîya ziman a pirtebeqeyî li ber çav girtîye û di vê çarçoveyê da em li ser bandora wê ya piralî hûr bûne.

* Kurteya vê gotarê di sempozyûma bi navê “Dicle Üniversitesi Lisansüstü Öğrenci Sempozyumu 4-5 Kasım 2025”ê da hatîye pêşkêşkirin.

** Xwendekarê Lîsansa Bilind: Enstîtuya Zanistên Civakî, Beşa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî Zanîngeha Dicleyê-Diyarbakir, salihsoner.21@gmail.com; ORCID: 0009-0004-7046-2312.

*** Prof. Dr. Beşa Ziman û Edebiyatên Rojhilatî, Fakulteya Edebiyatê ya Sezaî Karakoç, Zanîngeha Dicleyê-Diyarbakir; Fakulteya Îlahîyatê, Zanîngeha Bîtlîs Erenê-Bîtlîs; tahirhan.aydin@dicle.edu.tr / taydin@beu.edu.tr / tahirhan@hotmail.com; ORCID: 0000-0002-2586-2956.

Peyvên Sereke: Sazkirina Ziman, Pêvajoya Ziman, Pevguhazîya Zimanan, Nasname, Çand, Desthilatdarî.

Özet

Biz bu çalışmada, dilin tarihsel süreci üzerinde durduk ve birçok araştırmacının farklı yorumlarını sunduk. "Dil doğuştan mı gelir yoksa insanlar dili sonradan mı oluşturur? Dilin oluşumu insan eliyle mi gerçekleşmiştir yoksa kendiliğinden mi var olmuştur?" gibi sorular üzerinde durduk ve dilin yaratılışı ile tarihsel süreci hakkındaki görüşlere cevaplar sunduk. Diğer taraftan, iktidarın merkezi bir özne olarak dile nasıl yer verdiğini; ayrıca kültür ve kimlik inşasında, ulus-devletlerin kurulmasında ve yeni bir kültür üretilmesinde dilin temel rolünü nasıl ele aldığını ve dili nasıl elverişli bir araç olarak kullandığını belirledik. Aynı zamanda, kimlik inşasında dilin çok katmanlı özelliğini göz önünde bulundurduk ve bu çerçevede dilin çok yönlü etkisi üzerine odaklandık.

Anahtar Kelimeler: Dilin İnşası, Dil Süreci, Dillerin Etkileşimi, Kimlik, Kültür, İktidar.

Abstract

In this study, we focused on the historical process of language and presented various interpretations by numerous researchers. We addressed questions such as, "Does language originate innately, or do humans construct it later? Was the formation of language a human creation, or did it exist spontaneously?" and provided answers regarding the theories of language creation and its historical evolution. Furthermore, we determined how power, as a central subject, situates language; furthermore, we examined how the fundamental role of language is handled in the construction of culture and identity, the establishment of nation-states, and the production of a new culture, and how it is utilized as an effective tool. At the same time, we took into account the multilayered nature of language in the construction of identity and focused on its multifaceted influence within this framework.

Keywords: Language Construction, Language Process, Interaction of Languages, Identity, Culture, Power.

DESTPÊK

Her çend ziman ji dîroka mirovahîyê heta îro wekî amûra sereke ya pêwendîyê hatibe pênasekirin jî di serdemên modern û post-modern da aşkere bûye ku sînoren ziman gelekî firehtir in. Ziman êdî ne tenê amûrek e, di heman demê da wekî hêmaneka avaker a nasnameyê, dîrokê û çandê, di jîyana civakî û siyasî da roleka navendî digire ser xwe. Di vê çarçoveyê da, dewletan keşf kirîye ku ziman ji sînoren ragihandinê derbas dibe û dikare wekî amûreka stratejîk a desthilatdarîyê bê bikaranîn. Bi vî awayî, ziman di destê hêzên siyasî da veguherîye amûreka bikêr ku pê civakê û nasnameyan ji nû va sêwirandin. Ziman êdî ne tenê rêyeka fêhmkirina hev e, veguherîye qadeka kureyî (global) a ku desthilatdarî lê tê avakirin. Li ser vê bingehe, gelek desthilatdariyan ji bo sazkirina nasnameyeka neteweyî ya yekreng, ziman wekî amûreka sereke dîtine. Her çend ev projeyên netewesazîyê di hin mînakên pîrzimanî da bi ser ketibin jî li hemberî berxwedana resen a nasnameyan, ev armanc gelek caran bi bin ketîye. Ji alîyêkî din ve, ev zexta zimanî hem li ser ferdan hem jî li ser civakan barekî giran e psîkolojîk û siyasî ava dike.

Li vir gotina Max Weber a li ser dewleta modern tê bîra mirov: "Dewlet ew civata mirovan e ku di nav axekî dîyarkirî da tundîya fîzîkî ya meşrû di destê xwe da dihevine." (Ünlü, 2023). Lê belê, di nava mekanîzmayên dewleta modern da ev tundî tenê bi darê zorê bi sînor nemaye; li gor Pierre Bourdieu, dewlet bi rêya zimanê "fermî" herweha "tundîyeka sembolîk" jî dimeşîne. Ev tundî bi rêya sîstema perwerdeyê di hişê ferdan da sînoren "meqbûl" xêz dike û nasnameyên li derveyî vî sînorî wekî "ne-meşrû" nîşan dide. Di vê çarçoveyê da behsa taybetmendiyên pêkhêner û ji hev cihêker ên ziman tê kirin. Li gor Benedict

Anderson (Civakên Xeyalî) û kesên ku ramanên wî dişopînin, tevî ku civak nehevseng in jî hikûmet hewl didin ku bi rêya zimanekî hevpar dirûv bidin civakê da ku nasnameya neteweyî ava bikin. Ev yek nîşan dide ku ziman wekî stûna sereke ya "endezyarîya civakî" tê bikaranîn.

Wekî mînak, piştî hilweşandina Împeratorîya Osmanîyan di sazkirina komara Tirkîyeyê da dewlet polîtîkaya afirandina neteweyeka nû dimeşîne. Ji ber ku dewlet tenê taybetmendîyên tirkbûnê dipejirîne ev jî rê li ber qedexekirina ziman ango hebûna kurdîbûnê vedike. Ango Tirkîye dema netewe-dewleta xwe ava dike yekzimanîyê dike navenda polîtîkaya xwe. Bi vê yekê re, dewletê hewl daye ku bîra civakî ya kurdan ji koka wê biqetîne û bi rêya asîmîlasyonê nasnameyeka nû û "yekreng" ava bike. Herweha, ev hewldan nîşan dide ku ziman çiqas bi dîrok û hebûna çandî ve girêdayî ye; gava ziman tê hedefgirtin, di eslê xwe da dîrok û bîra wê civakê tê hedefgirtin. Lewre lê hatîye varqilîn ku ziman di navendê da ye û ji vî alîyê ve li ser kesayet û raya giştî roleka sereke dilîze. Ji alîyekî din ve jî hin teorîsyen li hev dikin ku bandora ziman û rola wê hîn mezintir e û dîsa li ser vê xalê hemfikir in ku bandora ziman ji ya ku em hay jê hene zêdetir e. Ziman ne tenê dinyayê rave dike, ew dinyaya ku em tê da dijîn bi xwe ava dike. Ji vî alîyê ve ev mînak dikare bê dayîn ku serdestî û desthilatîya sîyasî ango dewlet di kuştin û vejandina zimanan da xwedî roleka gelek krîtîk e. Mirov dikare bibêje ku aktora herî bi hêz û bi bandor e (Çiçek, 2013). Ev lêkolîn dê hewl bide ku rola stratejîk a ku ziman di parastina nasnameyê û afirandina nasnameyên nû da dilîze û girêdana hesas a di navbera ziman-dîrok, ziman-çandê da rave bike.

a) Ziman û Geşedana Dîrokî ya Ziman

Di pênaseya ziman, sêwirandina wê û taybetmendîyên wê da nêrînên cuda hene. **Ji ber ku ziman têkilîyeka giring di nav şanazîyeta mirov û çêkirina çanda wî da heye, lêkolînek li ser wê her gav nû peyda dibe.** Loma jî li ser pênaseya ziman pênaseyek heyî yan jî pênaseyek sînorkirî nayê pejirandin. Di derheqê ziman da fikra herî berbelav ew e ku ziman di navbera kesan da pêwendîya parvekirina hest û ramanan datîne. Ji bo mirovan parvekirina hest û ramanan pêwîstîyeka xwezayî ye.

Ziman hem amûra hişyarîyê ye û hem jî alava civakî ye ku bihayên çandî, mêjûyî û bawerî ji mirovê derdixe derve. Mirov hemû tiştên ku difikire bi awayê navxweyî û derveyî îfade dike (Renan, 2015). Di dawîya dawî da pênase û sêwirandinên ziman pevguhazîyê nîşan dide. Armanca hemû zimanan pevguhazî ye (Fischer, 2022). **Berî vê mirov dikare bibêje ku ziman berhemeka jîyanî ye ku li gor pêwîstîyên civak û demsalî her dem di prosesekê nûkirin û veguherînê da ye.**

Di derbarê geşedana ziman a dîrokê da herçiqas fikir û şiroveyên cuda hebin jî ji van fikir û şiroveyan gelekê wan di zemîneka hevpar da nehatine cem hev. **Lêkolînên dawî nîşan didin ku piranîya wan şiroveyan li ser hin bingeheên hevpar, wekî “xwezayîbûn” û “civakîbûn” a ziman, radigirin, lê di termînoloji û rêbazê da jî hev dûr dibin.** Bi gotinekî din di derheqê zanyarîyên geşedana ziman a dîrokê da sînoren teqez ên zanistî nehatîye xêzkirin. Di heman demê da ji bo zimanên cîhanê dayîna hikmên giştî yan jî pêşkêşkirina wan a di çarçoveyeka giştî da ji rastîyê dûr e. **Ev çarçoveyên giştî gelek caran di bin tesîra têgihîna kêmtir a berhemên zimanî yên herêmî û peyvên biqedr da didomînin.** Ji feylesofên qedîm Platon herçiqas gelek caran amaje bi bêjeyan kiribe jî şopên rêbazên zanistî di xwe da nahewîne. Arîrtoteles jî herçiqas di derbarê mijara gramera gelemperî da ceribandina yekem anîbe holê jî ji hûrgilîyên di derbarê ziman da dûr e. **Tê dîtin ku piranîya nêrînen li ser ziman, ji fehmeke felsefî derketîye, ne ji lêkolînên zanistî û empirîk.** Nêrîna giştî ev e: Her malbateke zimanî, her çend rêzikên zimanî yên hevpar û mecbûrî bi temamî red neke jî, di nav xwe de xwedî listeyeke pêdivîyan e ku xwe dispêre mentiqeka hundirîn e taybet û bingeheka struktural a kûr (Renan, 2015). **Her ziman wekî “sîstema îşaretan” tê famkirin û di nav xwe da qanûnên hundirîn dihevine ku bi rêya wê dikare bê fêrkirin û şirovekirin.**

Li gor hin vekoleran divê ziman bi xuliqandina Xwedê bê îzahkirin. Li gor hinekan ziman di pêvajoyeka xwezayî da bi pêş ketîye, li gor hinekan ziman alaveka hiş e, li gor hinekan ziman li ser hiş bandorê çê dike û li gor hinek kesên din jî di navbera

ziman û hiş da hevkarîgerîyek heye. Ev têkiliyên di navbera “Xwedayî, xwezayî, bîyolojîk û civakî” da, bi taybetî di sedsalên 19 û 20an da, bûne mijarên sereke yên lêkolînên ziman. Gelo ziman ji jidayîkbûnê tê yan paşê pêk tê, pêkhatina ziman bi destê mirovan hatîye çêkirin an jî jixweberi hebû? (Aykaç, 2016). Ev pirs her dem dihatin pirsîn. Lêbelê tê famkirin ku vekoler û zimanzan di vê çarçoveyê da li ser bingeheka hevpar xwedî fikreka yekgirtî nînin. **Hemû jî giringîya ziman û rola wî ya di jîyana mirovan da qebûl dikin, lêbelê li ser çavkanîya ziman, kengê û ji ku hatîye, çawa deketîye holê, nêrîn û gotineka hevpar tune ye.**

Ferdinand da Saussure li ser mijara çavkanîya ziman û xistina wê ya rojevê bêkêr û vala dibîne û bi vî awayî rave dike: “Bi rastî jî ziman ew berhem e ku wekî mîrateyek ji nifşên kevin maye û divê wekî xwe bê pejirandin: Ev berê jî wusa û bû îro jî wusa ye.” (Vghz. Renan, 2015). **Li gor Saussure, ziman ne tiştek e ku mirov her roj ji nû ve afirîne, lê paşerojeka mîratî ye ku her nifş û her civak dê di bin şertên xwe da dubare bike û biguherîne.** Ernest Renan jî dîyar dike ku ziman ji gîyanê mirov ê bîaqil jixweberî û bi carek ve derdikeve holê. Ango beşerîyet di seranserê çaxên dirêj da bi dahênana ziman da neketîye. Di cîhanê da çawa ku komên mirovan ên yekem derdikevin holê ziman jî ji carek ve derdikeve holê (Renan, 2015). Ji vê şiroveyê tê famkirin ku **geşedana ziman pêvajoyeka demdirêj û hevpeymaneka di navbera civak, hiş û çarçoveya dînî–felsefî da ye.** Wekî ku tê dîtin ramangerên ku fikrên xwe li ser ziman nîşan didin bi piranî hemfikir in ku ziman bi awayekî xwezayî pêk tê. Ji aliyê din ve em dibînin ku Arîsto ne di heman fikrê da ye. Fikra Arîsto ya li ser ziman gelek zelal e: **li gor wî** axiftin temsîla tecrûbeyê zîhnî ye.

Zimanzanê Amerîkî Chomsky’yê ku demên dirêj li ser ziman vekolîn kirine û bergeheka cuda pêşkêşî ziman dike dibêje ku mirov ji jidayîkbûnê ve xwedî kodên zimanî ne û ev yek, perçeyek ji bîyolojîya mirovan e û dibêje derûdora civakî jî sûd lê dike. **Ev raman bi navê “gramera xwezayî” tê nasandin û girêdana bingeheka a di navbera bîyolojî û hînbûna ziman da vedihewîne.** Bi awayekî din Noam Chomsky dîyar

dike ku hînbûna ziman behreyek e ku ji jidayîkbûnê tê. Ango ziman bi bîyolojîya mirovan ve gire dide. **Steven Pinker, Loftus û vekolerên din jî bi şêwazên cuda gotine ku mirov bi “amûra hînbûna ziman” tèn dinyayê ku di vê qadê da vekolînên taybetî hene.** Bi gelemperî pêvajoya bidestxistina ziman li ser îdeaya, behreya hînbûna ziman a zarokan ji jidayîkbûnê tê û “amûra hînbûna ziman” vê pêvajoyê beralî dike, ava dibe (Chomsky, Pinker, Loftus, 2023). **Ev gotin têgihîştineka nû pêşkêş dike ku li wir ziman tenê berhemeka civakî nîne, lê di heman demê da beşeka bingehîn a çêbûna mirovan jî ye.**

Hin vekoler hene ku li ser nirxandina ziman xwedî fikrên cuda ne. Ev vekoler nîşan didin ku ziman pevguhazîyeka bêhempa peyda dike û divê ev di çarçoveya quliqandina Xwedê da bê ravekirin. **Ji ber vê yekê, mafê zanistî û sînorên bawerîyên dînî gelek caran di şexsîyeta mirovan da bi hev ra dewam dikin.** Herder û Harman bi awayekî nezanistî yekîtiya ziman a navxweyî û hêza wî ya Îlahî radixin ber çavan. Ji alîyê din ve Jakob Grimm li hember vê fikrê derdikeve û vê şiroveyê dike: Eger ziman berî xuliqandina mirovan hatibe afirandin û wekî îhsaneka semawî hatibe dayîn, ne mafê zanistê heye ku li ser jêderka ziman vekolîn bike û ne jî di vî warî da alavekî guncav peyda dibe; lêbelê eger ziman berhemeka xwezaya mirovan be, bipêşketin û geşedaneka birêkûpêk nîşan bide wê demê pêkan e ku bi enduksîyonên meşrû heta dergûşa ziman biçin (Vghz. Renan, 2015). **Di vê ramanê da Grimm, ziman wekî çavkanîyeka zanistî dibîne ku bi rêya vekolînên empirîk mirov dikare bêyî sînorkirin û şirovekirinan pê ra têkilî dayne.**

Cousin dibêje ku nêrîna xuliqandinê meseleyê çareser nake. Nîşanên ku ji alîyê Xweda ve hatine dahênan dê ji bo me nebin nîşan. Ji alîyê din ve hin fikrên nêzîkê hev hene ku pêwendî di navbera vîna mirov û ziman da datînin. Li gor Steinthal ziman ji berê ve li gor planekê û li gor hişmendîyekê nehatîye afirandin, ziman di radeyeka geşedana jîyanê da bi awayekî mecbûrî derketîye holê (Renan, 2015). **Wekî ku xuya dike, li gor van, ziman, wekî navgîneke ku ji bo bersivên li hember**

pêwîstîyên jîyanê û hewcedariya ragihandinê derketîye holê. Lêbelê li gor K. Heyse ziman ji alîyê mirovan ve bi awayek azad hatîye afirandin, lewra dema ku mirov ziman afirandîye li gor tu sedemên dîyarker neçûye (Renan, 2015). **Du nêzîkbûn hene li vir. Li gor nêrîna yekem, ziman, ji ber "pêwîstîyên xwezayî" deketîye holê. Li gor ya duyem jî bi "afirandineka azad a mirovahîyê" derketîye holê. Ev her du alî, çarçoveya nîqaşa li ser ziman dîyar dîkin.**

Di dawîya dawî da di derheqê pênase û hebûna ziman da agahîyên teqez ên sînordar nehatine pejirandin. Li gor Wilhem von Humboldt: "Dema ku mijar ziman be divê mirov xwe ji angaştên giştî biparêze." (Renan, 2015). **Humboldt bi vê gotin bîr tîne ku axiftina li ser ziman tenê bi hevpeymanên giştî û pergalên pejirandî nayê bidestxistin; her mirovek, her civakek û her demek divê ji nû ve ziman wek bûyîneka zindî û çalak binirxîne.**

b) Têkilîya Ziman û Çandê

Di dîrokê da çand bi qasî xuliqandina mirovan xwedî dîrokeka kevn e. Bi gotineka din bi hebûna mirovan a li ser rûyê erdê ra hebûna çandê jî dest pê kirîye. Çand têgiheka gelek berfireh e, ji ber vê jî gelek hêmanên wekî ziman, dîn, kevneşopî, lîstik, xwarin, folklor û cil û bergan di xwe da dihewîne. **Herçend ev hêman di cîhanên cîyawaz da xuya dibin, lê bi hev ra girêdayî ne û divê di nav pergaleka giştî ya çandî da bi hev ra bîn nirxandin.**

Li ser vê babetê pirs "Gelo ziman çandê diafirîne yan çand ziman diafirîne?" tê kirin û li ser van pirsan nîqaş tên kirin. **Ev pirs, di nav zanistên wekî çand, sosyolojî, antropolojî û zimannasîyê da, wekî yek ji pirsên herî zêde hatîye nîqaşkirin, û carinan jî wekî "Kî kê diafirîne?" hatîye pirsîn.** Li ser vê mijarê du fikrên ku bi gelemperî hatîne pejirandin hene:

Li gor fikra yekem di navbera ziman û çanda ku ziman aîdê wê ye wekhevîyek heye. Ango ziman dîrok û nasnameyê îfade dike. **Wekî ku gelek vekoler dixwazin destnîşan bikin, ziman tenê amûra îfade û agahdarîya rojane nîne, lê di heman demê da “dîroka hevpar”, “bîranînên hevpar” û “rêwîtiya hevpar” jî di xwe da dihawîne (Fishman, 1991; Bourdieu, 1991).** Li gor vê fikrê qismeka mezin ya çandê ji aliyê ziman ve tê îfadekirin ku dema kesek bi zimanê xwe nikeribe biaxive ne mumkin e ku bibe endamê wê civakê. **Ji ber vê yekê, ziman gelek caran wekî “pasaporta civakî” tê dîtin: eger kesek zimanê civakê nizanibe yan jî wî bi kar neyne, dikare ku ew mirov li derveyî sînorên nasnameya civakî bê girtin (Fishman, 1991).**

Loma jî kesên ku nikarin bi zimanê xwe biaxivin an jî qet bi zimanê xwe neaxivîne herçiqas xwe ji aliyê hin hêmanan ve aîdê civakê bibînin jî çand wan kesan qebûl nake. Ev rewş bi taybetî di civakên ku têkoşîna nasnameyê dikin, guhertinên demografîk û tevgerên koçberiyê dijîn da diyar dibe. Herçiqas kesek di warê bav û kalan û hemû rîtûelan da bi wê civakê re hevpar bibe jî, eger ew zimanê civaka xwe nizanibe, ew hesteka domdar a kêmasiyê û “neaîdiyeta çandî” dijîn **(Fishman, 1991).** Bi piranî kesên ku birastî zimanê xwecîhî bi kar tînin xwedî li vê fikrê derdikevin û ziman wekî taybetmendîyeka jêner a etnîstîyê dibînin. **Mebest ji vê diyarkerîya etnîk ev e: Bêyî ziman, ne kurd, ne tirk, ne ereb, ne faris û ne jî nasnameyeka din a etnîk, nikare bibe nasnameyeka bêqisûr (Bourdieu, 1991).**

Li gor fikra duyem di navbera ziman û çandê da wekhevîyeka sînordar heye. Li gor wan di çandê da jî ziman bêtir hêman hene. Li gor fikra wan, herçiqas mirov bi zimanê xwe neaxive yan jî bi awayeka cuda biaxive jî mumkin tê dîtin ku ew mirov ji aliyê civaka xwecîhî ve bîr pejirandin, lewra hêmanên din bîngeha nasnameya çandî pêk tînin. Di her yek ji van hêmanan da, rîtûel, bawerî, stranên gelêrî, govend, kevneşopîyên di derbarê rolên jin û mêran de, hesasiyetên di derheqê rûzemînê da, û awayên daxwazên rojane ji Xwedê yan jî ji xwezayê xuya dibin. Ev hemû pratîk dikarin nasnameya çandî biparêzin

herçend zimanê di navbera wan de hevgirtina xwe winda kiribe yan jî zerar dîtibe (Hymes, 1974). Ziman wekî taybetîyeka jêger a etnîsîteyê tê dîtin (Cyrstal, 2015). **Bi gotineke din, li gor vê nêzîkatîyê, herçiqas ziman îro parastina nasnameya etnîkî hêsan dike jî, lê ne gengaz e nasnameya çandî tenê bi van peyvan bê sînorkirin (Fishman, 1991).**

Çawa ku di nav her etnîsîteyekê da ev her du nêrînên cuda hene û herçiqas hewcedarî bi lêkolînên zêdetir hebe jî li gor hin encamên rapirsîyan li Tirkîyeyê di nav civata kurdan da jî ev her du nêrîn hene. Herçend hin kes ziman wek "sînorê çandê" dibînin, hin kesên din gelek caran zêde giringîyê didin wate, rîtûel û hêza piştgirîya çandî. Ev her du perspektîf bi tenê bi astên teorîk ve sînordar nînin; ew di jiyana rojane, di awayên jiyana bi hev ra û di pratîkên têkoşîna çandî de bi zelalî xuya dibin.

Lê belê fikra hevpar ew e ku ziman hem hêmana herî giring a çandê ye hem jî peywira neqilkirina çandê hildigire. Tê dîtin ku hin zimanzan ziman wekî barhîlgirekî çandê dibînin û herî zêde taybetîya ziman a neqilker derdixin pêş. **Di vê çarçoveyê da ziman wekî “karkerê ji dil ber bi dil ve” tê dîtin: wêneyên çandî, rîtûel, stran û çîrok hemû, bi navan, peyvan û hevokên zimanî ji nirxekî ber bi nirxekî cuda ve tên guhastin (Hornberger, 2008).**

Ziman îfadeya nasnameya çandî ye û her ziman di nav xwe da dirok, nirx, bawerî û tecrîbeyên civakê neqil dike. Ji ber vê sedemê bikaranîna ziman, alava îfadeya nasname û xwemalîbûna hestî ya kesekî yan jî ya civakê ye (Chomsky, Pinker, Loftus, 2023). Mirov zimanê xwe tenê ji bo gotinê bi kar naîne, di heman demê da, bersiva pirsyarên wekî "em kî ne, em ji kû hatine, em çi dikin"ê bi awayekî zindî di nav zimanê xwe da diafirîne (Fishman, 1991). Ziman û çand bi hev ra girêdayî ne û bandorê li hev dikin. Ziman ne tenê îfadeya çandê ye, herweha di mijara pênasakirin û watedarkirina çandê da pêkerekî sereke û bi bandor e (Chomsky, Pinker, Loftus, 2023). Ji ber vê yekê, guherîna ziman dikare şewaza dîtin û nîşandana çandê ya civakê jî biguherîne; wekî mînak, ketina peyvên nû yên teknolojîk di nav

ziman da, dibe sedema pêşketina çanda dijîtal. (**Hornberger, 2008**).

Di nav civakên cihanê da ziman mijareka sereke ye. Ji ber vê yekê, ziman bûye qada xebatê ya gelek zimanzan û lêkoleran; herweha ew li ser giringî û hesasîyeta ziman bi hûrgilî rawestîyane (Hornberger, 2008). Di vê çarçoveyê da, di têkilîya ziman û çandê da hin lêkoler derdikevin pêşberî me û nîşan didin ku ziman nirxekî wusa ye ku nabe mirov jê vegere; windakirina vî nirxî xeterîyeke mezin e. Ev nêrîn bi taybetî di çarçoveya zimanên ku di bin xetereyê da ne -wekî gelek zimanên herêmî, zimanên kêmteweyan û zimanên neteweyên bêdewlet-hêsanîr tê famkirin (Fishman, 1991; Skutnabb-Kangas, 2000).

Ew amajê bi ferqa mezin a di navbera hebûn û tunebûna zimanî dikin û balê dikişînin ser hesasîyeta cihê navendî yê zimanî. Windabûna zimanî ji bo çandê wekî dilekî ku li ber krîzeke giran e (Crystal, 2015). **Gava ku ziman di pêvajoya windabûnê da be , hem alava ragihandina rojane winda dibe, hem jî “dîlê çandê” dikeve bin xetereyê; stranên kevn, çîrokên gel, gotinên pêşîyan û rîtûelan bê peyv hêdî hêdî tî jibîrkirin (Skutnabb-Kangas, 2000).** Digel gûherîna ziman, ji bo dewama çandê palpiştên bihêz jî hene. Çanda nû wekî ya berê nabe, lê bi giştî jî cuda nabe (Crystal, 2015). **Ev tê wê wateyê ku her çand, di dema guherîna zimanî yan jî di rewşa jinûveavakirinê da, tenê bi guhertina şewaz, mijar û peyvên xwe zindî dimîne; lê belê bi temamî ji binyadê xwe yê berê venaqete (Hornberger, 2008).**

Çand xwedî girîngîyeke mezin e û ziman di vê xalê da xwedî erkeke heyatî ye. Lewra çand di eslê xwe da, bi rêya zimanê devkî û nivîskî tê veguhastin (Crystal, 2015). **Zimanê devkî di rîtûel, beyt, stran û çîrokan da xwedî roleka sereke ye; zimanê nivîskî jî derfet dide ku ev berhem bîna nivîsîn û arşîvkirin da ku di nav nîfş û serdeman da bigihîjin hev. Her du bi hev ra, di veguhastina çandê da pergaleke dualî ya herdemî diafirînin (Hymes, 1974; Hornberger, 2008).** Balkêş e ku qîmeta zimanî bi zindîbûna wî ve, têkçûna wî

jî bi mirina mirovan ve tê girêdan. Herweha, ev îdia û şirove tê kirin ku windabûna zimanê ji bo mirov windakirina nirxekî heyatî ye. **Ji ber ku bi mirina her kesî ra, beşek ji bîranîn, ziman û tecribeyên wî jî winda dibe; gava ziman wekî pergal bi temamî ji holê radibe, ev windabûn pir kurtir dibe (Skutnabb-Kangas, 2000).**

Dema ku veguhastina zimanê ji ber mirina zimên bê qutkirin, ew zanyariyên ku em mîratgirên wan in, bi awayekî cidî winda dibin. Crystal (2015) vê rewşê weha tîne ziman: “Kêmbûna di pirrengîya zimanê da dibe sedem ku hêza adaptasyona nîfşê me kêm bibe; lewre ev kêmbûn, hewza zanîna me ya ku em jê sûdê werdigirin biçûk dike.” **Bi gotineke din, her ziman ji bo mirovan çavkanîyeke nû ya têgihiştin, teswîrkirin û berxwedana li hemberî awayên cuda yên jiyanê ye. Gava ev çavkanî winda dibin, kapasîteya me ya adaptasyon, lêkolîn û hilberîna çareyan jî sînordar dibe (Hymes, 1974; Hornberger, 2008).** Zanyayekî qadê dibêje: “Windabûna zimanek ji ser rûyê erdê wekî kanîyeka surîştî ku bimiçiqe û nikaribe xwe nû bike.” (Crystal, 2015). Ev mînak nîşan dide ku her ziman, wekî kanîyekê, çavkanîyeka biqedr û bêhempa ye; gava ew kanî diçike, ne tenê av, herweha ew çavkanîya pîroz a hişyariyê û zanîna kevînar jî winda dibe (Skutnabb-Kangas, 2000).

c) Pêkhatina Nasnameyê û Ziman

Nasname ew têgih e ku di serî da ziman û hemû hêmanên ku çandê pêk tînin di xwe da dihevine; herweha xwedîyê wê taybetmendîyê ye ku kesekî ji kesekî din cuda dike. Ango nasname 'min' û 'yê din' ji hev cihê dike. Bi gotineke din: “Çi ye ev ziman? Ma ne ew tişt e ku miletekî ji miletekî din cuda dike, me ji wan cuda dike?” (Hobsbawm, 2010). Di vê çarçoveyê da nêrînên cuda yên kesan bi nasnameyê ra têkildar in. Nasname ew hîm e ku kesên civakê, bi awayekî ku bînan nasîn, wekhev dike (Crystal, 2015).

Bi rastî, nasname carinan wekî "tûrikekê" tê famkirin ku di nav da ziman, bawerî, çand, rîtûel û bîranînên hevpar bi hev ra cih digirin; lê di nav van hemûyan da, zimanê ku mirovek bi wî ra mezin dibe, herî zêde balê dikşîne. Di vê peywendê da ziman hem hêmaneka xwezayî ye û hem jî nasnameyê jî bo jenerasyona nû neqil dike. Wekî ku vekoler di sosyolojî û antropolojîya zimanî da destnîşan dikin; her gava ku zarokek bi dê û bav, malbat û koma xwe ra bi zimanekî taybet diaxive, ew di heman demê da "nasnameya xwe ya pêşî" ava dike û nas dike (Hymes, 1974; Fishman, 1991). Yek bi yek nasnameyên kesan, nasnameya civakê pêk tîne, loma jî jî bo ku em civakê fam bikin divê em li zimanê wê civakê binerin (Crystal, 2015). Lêkolînên li ser civakên pîrzimanî jî nîşan didin ku bêtir famkirina rola zimanî, têgihiştina pêvajoya avabûna nasnameya civakî û neteweyî jî kêr dimîne (Hornberger, 2008).

Ji alîyekî din ve tê dîtin ku sînorên zimanî bêtir tên firehkirin û gelek hêmanên din jî tevî van sînoran dibin. Ango têkilîya gelek qadên jiyanê bi ziman ra tê danîn. Tabloyekî wisa li ber çavan e ku tê da sînorên ziman bi koçberî, dijîtalîzebûn û têkilîyên navneteweyî ra fireh dibin; loma mirov gelek çarvan di navbera "her du alîyan" da dimînin: Li alîyekî ziman û nasnameya xwemalî, li alîyê din jî zimanên ku jî bo kar, perwerde yan medyayê tên bikaranîn (Bourdieu, 1991).

Ziman tenê nîşan nade ku em jî ku tên, em çî dipejirînin an jî em aîdî kê ne; ziman di heman demê da dibe amûreka taktîkî û stratejîk ku em pê mafên xwe yên takekesî, zayendî û etnîkî diparêzin. Herweha, ziman nîşanî me dide ku em ê di nav daxwazên civakê da rêya xwe çawa bibînin, em çî dixwazin, em ê daxwazên xwe çawa pêk bînin û van daxwazan bi yên din ra çawa parve bikin (Fischer, 2022). Ji ber vê yekê, ziman ne tenê perçeyekî "nasnameyê" ye, lê di heman demê da amûra plankirina taktîkî û stratejîyên civakî ye jî. Kes an komên ku ziman bi awayekî çalak, rojane û pergalî bi kar tînin, dikarin di warên siyasî, hiqûqî û perwerdeyî da xwe baştir biparêzin (Skutnabb-Kangas, 2000).

Di nav hemû behreyên mirovî da, ya ku herî zêde ji me ra rave dike ka em kî ne, em çî dixwazin û em ber bi ku ve diçin, ziman e (Fischer, 2022). Robert Dixon jî dibêje: “Ziman çavkanîya herî giranbuha ya mirovahîyê ye.” (Fischer, 2022). Ev gotin bi awayekî aşkere nîşan dide ku eger em bixwazin li ser nasnameya kesane, civakî yan jî neteweyî biaxivin, divê em pêşî ji peyv û çarçoveya zimanî dest pê bikin: Kesê ku çavkanîya zimanî winda dike, gelek caran alîkarên (hêmanên) xwe yên di nav nasnameyê da jî winda dike (Fishman, 1991).

Dema fikrên vekolerên ku li ser ziman lêkolîn kirine li ber çavan bê girtin dê bê dîtî fikra hevpar ew e ku di pêkhatina nasnameyê da ziman xwedî rolek xeternak e. Ji bo gelek neteweyan, bi taybetî ji bo neteweyên bêdewlet an jî komên ku hêj di bin zordariyên siyâsî da dijîn, ziman bûye herêmeke ku tê da hem berxwedan hem jî xeterî tê dîtî: Ziman dikare nasnameyê biparêze, lê di heman demê da dikare wê nasnameyê bike hedefa êrîşan jî (Skutnabb-Kangas, 2000). Lewre wekî rengvedana pêvajoya dîrokî, fikra serdest ew e ku civakên bi heman zimanî diaxivin, xwedî heman nasnameyê ne. Ango dikare bê gotin ku zimanê etnîsteyekê, nasnameya wê ye. Lêkolînên Fishman (1991) ên li ser ziman û nasnameya komelî nîşan didin ku 'komên zimanê xwe diparêzin, bi rastî di nav berxwedana man û nemanê da cih digirin'; ji ber ku windabûna zimanî, pir caran nîşaneyê herî eşkere ya windabûna komê bi xwe ye.

Herweha, di avakirina dewletên neteweyî da hebûna zimanekî fermî yê yekta, yan jî pêkanîna wî di hilberandina nasnameyê da, amûra bingeîn e. Ji vê yekê jî em têdigihîjin ku ziman perçeyekî jênerê e nasnameyê ye. Bourdieu (1991) zimanê fermî wekî beşek ji "hêza sembolîk" şirove dike; ev ziman, gava ji aliyê dewlet, perwerde û medyayê ve tê piştgirîkirin, di nav bazarên civakî û aborî **da** dibe pîvaneka navendî. Ev rewş dibe sedem ku mirovên din zimanên xwe wekî amûrên ku "destkeftiya wan kêmtir e" bibînin. Bi vî awayî, nasnameya civakî gelek caran di navbera devjêberdana zimanekî û jênerîya zimanekî din **da** tê avakirin (Hornberger, 2008).

d) Di Hilberîna Nasnameyê da Rola Navendî ya Ziman

Hilberîna nasnameyê, bi taybetî di serdemên modern û postmodern da û di avakirina dewletên neteweyî da cihekî navendî girtiye. Ango di pêkanîna dewletên neteweyî yên nû da nasnameyeka nû tê afirandin; yan jî çandên ku hatine paşguhkirin, ji nû ve tên pênasekirin û hilberandin. Ew netewedewletên nû yên ku ji aliyê Benedict Anderson ve wekî "cemaetên xeyalî" tên binavkirin, tam bi vê hilberîna nasnameyê pêk hatine. Netewe, civakeka sîyasî ye ku hatiye xeyalkirin (Anderson, 2020). Anderson di vê çarçoveyê **da destnîşan dike** ku netewe ne tiştekî "Xweda-dayî" ye, lê xeyaleke hevpar e ku ji hêla çand, medya, ziman û amûrên sîyasî ve di demeke taybet **da** tê avakirin.

Di vê çarçoveyê da Gellner jî balê dikişîne ser vê xalê ku: "Neteweperwerî ne ew pêvajoya ye ku netewe lê şiyar dibin; neteweperwerî li cihê ku netewe lê tune ye, wan îcad dikin." (Anderson, 2020). Herweha Hobsbawm (2010) dibêje: "Netewe, dewlet û netewetîyê naafirînin; ya rast beravajîya vê ye." Ango dewlet û neteweperwerî, neteweyan diafirînin. Ev rewş jî diyarkerîya dewletê ya li ser hêz û derfetan nîşan dide. Lêkolînên dîrokî û sosyolojîk destnîşan dikin ku dewlet wê çarçoveyê çê dike ku tê da "netewe" wekî hevpeyvîneke şerî, sîyasî û çandî tê îcadkirin; bi vî awayî dewlet xwe wekî "hakim" û wan jî wekî "gel" pênase dike.

Bêguman, ya ku di vê mijarê da destê dewletê bihêz dike, zimanê hevpar ê fermî ye. Helbet di vê pevgirêdanê da pêkanîna zimanê fermî yê hevpar ji aliyê desthilatdaran ve bi zagonan hatiye tekûzkirin. Eger em li dîroka neteweyên cîhanê binêrin; her ku tune kirina zimanên herêmî, asteng kirina zimanên kêmteweyan an jî bilind kirina zimanekî wekî "tenê zimanê fermî" hatibe xwastin, li wir em dikarin şopên têkilîya navbera hilberîna neteweperwerîyê û sîyaseta zimanî bibînin (Fishman, 1991; Skutnabb-Kangas, 2000). Di vê çarçoveyê da ziman di bidestxistina nasnameyê da roleka sereke dilîze. Ziman wekî "hevgirêdaneka sembolîk" dixebite ku bi alîkarîya xwe têgehên

“em” û “wan”, “ax û nişan”, “dîrok û pêşeroj” bi hev ra girê dide (Bourdieu, 1991).

Ziman behreya bi hev ra jîyanê û hevkarîya mirovan zêde kir. Loma jî ev şirove dikare bê kirin ku ji bo nasnameyeka hevpar, divê zimanekî hevpar hebe. Zimanekî hevpar dikare bibe hêmana yekkirina mirovan û pêwendîyên civakî bi hêz bike (Chomsky, Pinker, Loftus, 2023). Lê dibe ku zimanekî hevpar ne tenê li hember zimanên din, lê herweha di nav xwe da jî wekî "standardekê" li hemberî zaravayan, zimanên herêmî û şeweyên axiftinê bê ferzkirin; ev standardkirin, zimanê ku li ser nivîs, pergalen perwerde û medyayê hatiye avakirin, dike çavkanîya sereke ya nasnameyê (Hymes, 1974; Hornberger, 2008).

Hin ziman ji ber ku di perwerdeyê da di dadgehan da û di leşkerîyê da hatine bikaranîn, bûne xwedîyê statûyeka berztirîn (Aykaç, 2017). Ev statû, rola ziman a hilberîner nasnameyê tîne rewşeka stratejîktir. Gava zimanek di dibistanan, fermandarî, mediasî û pergalen leşkerî da wekî zimanê fermî û sereke tê bikaranîn, ew ne tenê amûra agahdarîyê ye, lê jî dibe “destpêka mafê gihîştinê” an “rûmet û fursêten civakî”; kesên ku vê zimanê baş nizanin, pir caran ji cihên herî bingeîn yên nasnameyê û karûbarê civakî derveyî dimînin (Bourdieu, 1991). Plansazîya ziman di heman demê da perçeyeka veguherînên civakî ye jî (Aykaç, 2017). Li gor lêkolînên siyaseta zimanî, her plan û pergalekî û “standardkirin” an jî “normalîzekirin” a zimanê bi rastî dikeve nav navçeyên hêja yên şerê di navbera modelên nasnameyê da (Hornberger, 2008). Plansazîya ziman plansazîya hilberîna çandê nişan dide.

Hin ziman ji ber ku di perwerdeyê da, di dadgehan da û di leşkerîyê da hatine bikaranîn, bûne xwedîyê statûyeka bilind (Aykaç, 2017). Ev statû, rola ziman a di hilberîna nasnameyê da tîne rewşeka stratejîktir. Gava zimanek di dibistanan, fermandarî, medya û pergalen leşkerî da wekî zimanê fermî û sereke tê bikaranîn, ew ne tenê amûra agahdarîyê ye, lê herweha dibe "mifteya gihîştina mafan" an jî "rûmet û fersendên civakî".

Kesên ku vî zimanî baş nizanin, gelek caran ji qadên herî bingehîn ên nasnameyê û karûbarên civakî derveyî dimînin (Bourdieu, 1991). Plansazîya zimanî di heman demê da parçeyeke veguherînê civakî ye jî (Aykaç, 2017). Li gor lêkolînên sîyaseta zimanî, her plan, pergala û "standardkirin" an jî "normalîzekirin" a zimanî, bi rastî dikeve nav qadên herî krîtîk ên şerê di navbera modelên nasnameyê da (Hornberger, 2008). Plansazîya zimanî, plansazîya hilberîna çandê bixwe ye.

Di dawîya dawî da, nêrîna ziman a di hilberîna çandê da, di pozîsyona kirdeyê da xwe dispêre me. Gava ku em di çarçoveya neteweperwerîyê da li ser "bîrwerîya giştî", "mîratên çandî" û "rîtûelên neteweyî" diaxivin, gelek caran ziman wekî wê qadê tê dîtîn ku hemû van rîtûel û nîrx lê kom dibin. Ziman her carê ji nû ve hildiberîne û dubare dike ka em kî ne û em dixwazin kîjan nasnameyê biparêzin (Fishman, 1991; Hobsbawm, 2010). Avahîsazîya dawîn a civakê û teşedana wê ya ji nû ve, bi zimanî tê pîvandîn (Fischer, 2022). Ev tê wê wateyê ku her carê gava "mirov û netewe xwe nû dîkin", vê yekê bi peyv û zimanê xwe dîkin; slogan, stran, qert û gotinên bingehîn ên sîyasî jî wekî şandeyên rast û rasterast ên hilberîna nasnameyê dixebitin (Anderson, 2020; Bourdieu, 1991).

Encam

Ziman herçiqas di bingeha xwe da amûra pevguhazîyê be jî, yek ji sedemên bingehîn ên hebûna civakê ye ku nasname, çand, bîr û dîrokê vediguhêze nîfşên nû. Di dîrokê da ziman her dem bûye bingeha amûra xweîfadekirinê, aîdîyeta civakî û mîrateya çandî. Di vê pêwendîyê da ziman hem di avakirina nasnameyê da û hem jî di parastina nasnameyê da xwedî roleke navendî ye. Her du ast -ya kesî û ya kolektîf- bi rêya zimanî xwe dixin nav çarçoveya "em" û "wan", "mal" û "derveyî"; ev çarçove jî di demên cuda da ji nû ve tê avakirin.

Di serdemên modern û postmodern da erka ziman tenê bi pevguhastinê ra sînordar nemaye; herweha di qadên civakî,

sîyasî û çandî da bûye hêmana sereke ya hilberîna nasnameyê. Pêvajoya avakirina netewedewletan, ku tê da bi saya ziman hewldana afirandina nasnameyeka homojen heye, bi zelalî nîşan dide ku ziman ji alîyê desthilatdaran ve çawa tê bikaranîn. Lêbelê van pêvajoyan her dem encamên serkeftî nedane; berovajî, di civakên pîrzimanî da bûye sedema berberîya di navbera nasnameyên takekesî û kolektîf da. Pêvajoya yekzimanîkirina dewletan gelek caran zimanên din ji qadên perwerde, medya û pergala fermî dûr xistin; li hemberî vê yekê civakê gelek caran bi şêwazên xweberparêzîyê -wekî zimanê malê, huner, stran û rîtûelan- daxwaza parastina nasnameya xwe zindî hîşt.

Ziman di çarçoveya veguhastina bîra çandî da, di domandina dîrokê û veguhastina nîrxên civakî da û di parastina nasnameyê da amûreka sereke ye. Her gotinek, çîrok, zarava yan gotinên pêşîyan ên li ser jîyana mîr û jinan, di rastî da beşek ji wê mîratê ye ku ji serdemeke berê tê; di serdemeke nû da jî, çi di zimanekî nû da be çi di heman zimanî da be, tê veguhastin. Ji ber vê yekê, windabûna zimanekî ne tenê windakirina şêwazeke pevguhastinê ye; herweha di heman demê da windakirina nasname, dîrok û cîhanbînîyê ye. Gava zimanek bi awayekî berdewam ji cîhanê winda dibe, beşek ji bîra kolektîf, mîratên hunerî û çarçoveyên têgihîştinê jî hindik hindik qutîya xewnên mirovan vala dike.

Di encamê da, erka ziman a li ser avakirina nasnameyê pirtebeqeyî ye: kesan bi civakê ve girê dide, bi civakê ra hişmendîyeka hevpar çê dike, rabirdûyê vediguhêze îro û berdewamîya çandî diparêze. Ziman di navbera şexs û civakê da cihê “pêwendîya dijîtal û fîzîkî” digire: çi di jiyana serhêl (online) çi jî di ya derveyî serhêl (offline) da be, axaftina mirovan, rengên nasnameyê, daxwaza mafan û hevparastina çandî dîyar dike. Ne pêkan e ku mirov bê ziman behsa nasnameyê û bê nasname jî behsa zimanî bike. Ji vê girêdanê jî tê famkirin ku di seranserî dîroka mirovahîyê da ziman semboleke çiqas bihêz e û xwedî hêzeke civakî ye. Ji bo vê yekê, di perwerde, sîyaseta zimanî û xebatên li ser parastina zimanên di bin metirsîyê da, giring e ku ziman tenê wekî amûra pevguhastinê neyê dîtin; belkî divê wekî

bingeha nasnameyê, mafên mirovan û mîrata çandî bê şirovekirin.

ÇAVKANÎ

Anderson, B. (2020). *Hayali Cemaatler*. İstanbul: metis.

Aykaç, Y. (2016). Dîroka Zimannasîya Giştî û Xebatên Zimannasîyê di Kurdî de. di nav *Waneyên Zimannasîyê da*, Ed: Ümran Altinkılıç. Diyarbakır: Lîs. rr. 43-54.

Bourdieu, P. (1991). *Language and Symbolic Power*. Harvard University Press.

Chomsky, N., Pinker, S., & Loftus, E. (2023). *Dil, Düşünce ve Bellek*. Ankara: Gece Kitaplığı.

Cyrstal, D. (2015). *Dillerin Katli*. İstanbul: Profil.

Çiçek, C. (2013). *Zimanek Çima Tê Qedexekirin*. Stenbol: Peywend.

Fischer, S. R. (2022). *Dilin Tarihi*. İstanbul: Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları.

Fishman, J. A. (1991). *Reversing language shift: Theoretical and empirical foundations of assistance to threatened languages*. Multilingual Matters.

Hohsbawm, E. J. (2010). *Milletler ve Milliyetçilik*. İstanbul: Ayrıntı.

Hornberger, N. H. (Ed.). (2008). *Encyclopedia of language and education* (2nd ed., Vols. 1-10). Springer.

Hymes, D. (1974). *Foundations in sociolinguistics: An ethnographic approach*. University of Pennsylvania Press.

Önen, R. (2018). *Ziman û Netewesazî*. Stenbol: Peywend.

Skutnabb-Kangas, T. (2000). *Linguistic genocide in education—or worldwide diversity and human rights?* Lawrence Erlbaum Associates.

Renan, E. (2015). *Dilin Kökeni Üzerine*. İstanbul: Bilge Kültür Sanat.

Ünlü, B. (2023). *Türklük Sözleşmesi*. Ankara: Dipnot.